



M. Borîsovna Rudenko

Margarîta Borîsovna Rudenko heta dawîya jiyana xwe xebatên xwe ên zanistî dewam kirin. Wê bi tîgêhêstineke kûr, bi jîrbûn, bi enerjîyeke bêdawî kedeke bêhempa daye ji bo edebiyat, çand û hûnera kurdî û ji 350'an zêdetir berhem afirandiye... *Aysel Tabak / R.5*



Tara bêjîngê

Li bin zerdika dilme a roka deştê, jînikan kêr û meqes li bin tara bêjîngê dinivandin û di dest xwe re tara bêjîngê jî bi gulîyeke ji werîsekî mû rêsandî digelandin, piştî zarok li ser wekî nidreke çênî datanîn û ew peşk bi peşk jî çilê wî didizîn û direvandî... *Civan Qado / R.5*



Heta ku?

Du meh û nîv e, ji sê çar caran pê ve, ew jî bi banga mela re, min piyê xwe navêtiye derva. Naçim mala tu merivêkî xwe. Çend caran kesên ji bo werin malê li min geriyabin jî, min rê neda wan. Lê çiqas cara ku min di şibakê de jî li derdorê nihêrtiye... *Berfin Dije / R.10*

Rojnameya
Heftane

www.xwebun.org

xwebûn

1-7 Heziran 2020

Hejmar: 24

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

Apê Mûsa 100 salî ye



Lê dinyayê lê dinyayê...

Di 1943yan de ez midûre "Dicle Talebe Yurdî" bûm. Rojêkê du polis hatin Yurdê û ez girtim birim "Birinci Şube"yê. Çawa ez ketim hundir, sê-çar polis li min civiyan, bi pehinan, bi şeqeman û bi daran bi min ketin.

Ez şaş mam. "Lawo ma min çi kiriye?"

Mezinê wan got: "Hi kurê kerê tu nizanî te çi kiriye?"

Min got: "Na!"

"Ma kero radyoya we tine?"

Min got: "Heye."

Got: "Xayin lawê xayinan ev qas plakên xweş ên bi tirkî hene, çima hûn di yurdê de bi kurdî difikînin?"

Sûcê min û sedema lîxistina min, bi kurmançî fikandina me bû.

Paşê di 1959an de li Diyar-bekrê, di rojnameya "Îlerî Yurdê" de bi kurmançî min şîrek nivîsî. Navê şîrê "Qimil hat lo Apo" bû.

Hoy babo tu yî û te bi kurdî nivîsiye...

Celal Bayar û temamê sernivîskarên rojnameyên tirkan rabûn ser lingan.

Hinekan digotin, "Serê wî bi-perçiqîn."

Hinekan jî digotin, "Zîmanê wî jêkin."

Ez girtim û kirin hepsê. Heta ku min xwe ji nav lepên wan xelas kir, nivê ruhê min çû.

Lê di vî nivê ruhê minê mayî de, elhemdülillah îro di paytexta Osmanîyan de, Stenbolê, em rojnameya xwe ya bi zîmanê xwe dertînin.

Ez geleki bextiyar im ku min ev roj dît, lê heyfa min jî ew e ku gelek hevalên min ên hêja bi vî hesretê çûn rehmetê. Hêvî û bawerîya min ew e ku wê xortên me yê hêja roj bi roj bi vî karê xwe yê spehî dilê min xweş bikin û ruhê hevalên min ên çûyî jî şad bikin.

Berê kurd bavik bûn. Paşê bûn eşîr. Lê îro ez dinêrim kurd êdî bûne millet. Xuya ye ku bavik û eşîr dîtina wan teng e, tim neyarê hev in. Her bavikek diji bavikê din e. Her eşîr jî dijmînê eşîreke din e.

Di tarîxa kurdan de bi sed salan jî vî awayî kurd perîşan û bindest man. Lê ez dinêrim îro kurd êdî jî van dubendîyan xelas dibin. Dibin millet. Yanî yekpare kurd û Kurdistan.

Mûsa Anter

(Rojname 29.12.1991)

Ji bo veşartina li peyarêyê bi kes jî bêkes kirine

Cenazeyên zarokên kurdan ên di 19'ê kanûna 2017'an ji goristana Xerzanê ya li gundê Oleka Jor a Bedlîsê hatibûn dizîn, li Stenbolê li peyarêya goristana Kilyosê ya Bêkesan hatine veşartin. Li gel ku heta niha dihat zanîn ku 267 cenaze hatine dizîn jî bi rapora Saziya Tiba Edlî (ATK) ya Stenbolê derket holê ku

281 cenaze hatine dizîn û ji van tenê 21 cenaze radeştî malbatên wan hatine kirin. Kesên nasnameyên wan diyar in û ruxseta wan a definkirinê heye jî li peyarêya goristana navçeya Kilyosê ya Stenbolê veşartine. Parêzeran destnîşan kirin ku dê veşartina cenazeyan a li peyarêyê dê bibe NY û DMME'yê... *RÛPEL - 3*


LI KERBORANÊ

40 kilox hatin dîtin

Bajarê herî zêde mirov lê hatine windakirin û hestî lê hatine dîtin Mêrdîn e. Heftaya borî dîsa bi awayekî tesadûfî li şikefteke mezraya Lîbka Kaniya ya gundê Derêca yê navçeya Kerboranê ya Mêrdînê 40 kilox hatin dîtin... *RÛPEL - 3*

Hevpeyvîn bi xortekî 70 salî re...

Firat Cewerî / RÛPEL - 4



Muzîkê de qonaxêko newe

Hetê fonksiyonê ra muzîkê Adir Janî muzîka kurdî de qonaxêko newe ya. Muzîka kurdî ya Bakura çewrês serranê peyên hetê fonksiyonê ra melankolîze biyo. Mûzîka kurdî de qe keyf, şa, bextewarî... nêmeno. Malmîsanîj şîrêkê xo de vano " lulîya ma senfonîya derd û kulan" kê şêyîni wîna vajî ke muzîkê ma biyo senfonîya derdan, kulan, dejan, xeman... î." Sameda ke albûmê Leylayî de no melankolî çîn o, xo no melankolî ra seveknayo nayê... *Welatramîn Azad - R.9*

Min Ev Helbest Çawa Nivîsî?

Me dirokek heye. Heke siya Agirî nede ser Kobanî, em jî çi ra ne? Em bo çi jiyân? Naxwe divê Yado, Ferzende, Seyîdxan, Şêx Seîd, Rostemê Zal û Keyxusrev ligel hespên xwe bîn hawarê da şerekî "Rostemî" biqewime. Ku çûbin hawara wan hespan, divê kêl hişyar bûbin... *Selîm Temo / R.12*



Bijan



Munewer Azizoglu Bazan

Divê kurd xwe ji mêtîngêriyê rizgar bikin

Di dîroka tevger û têkoşînên şoreşger û her weha yên neteweyî de yên paradigmayê xwe di asta destpêkê de li ser bîngeha azadiya jinê sazî kirine, ez bawer im ne zêde ne. Azadiya jinê wek temînatî azadiya civakê dîtî û him di asta teorîk û him jî di asta pratîk de xistina meriyetê ya vê nêrînê yek ji serketiyên tevgera azadiya kurd e. Ev tespît, bi gotîneke din ev rêbaz (lewre ev jî analizêkê wêdetir, wek peywir derdikeve pêş) bû sedema hin encamên dîrokî. Bi taybetî di mijarên “netewewewlet”, “desthilatdarî”, “serdestî”yê de, ku di heman demê de sedemên tekçûnê şoreşên sedesala 20'êmin bûn, şiroveya li ser bîngeha nakokîya zayendên “jin û mêr” xeta esasî ya vê paradigmayê binxêz dike.

Bêguman rexneya li “desthilatdariyê û têkiliya wê ya yekser a bi zayenda mêr re” ne keşfeke nû ye. Bi taybetî rêxistinên femînîst û jinan der barê vê têkiliyê de û encamên wê yên civakî, politîk, aborî û hwd. de gelek lêkolîn kirine û nivîs nivîsandine. Lê ev mijar di nav rêxistinên jinan de jî bi heman awayî nayê destgirtin. Li gorî tecrûbeyên wan ên tepîsandinê/bindestiyê helwestên cuda jî derdikevin holê. Wek mînak dema femînîstên bakurê cihanê “desthilatdariyê” bi giştî bi “mêr/zilamî” re pênase dikirin û hemî jin wek bindestê vê yekê didîtin, jinên başûrê cihanê bal kişandin ser “desthilatdariya jinên bakurî/spî” ku ew jî wek mêrên serdest/spî serdestî li ser jinên bindest dikirin. Li gorî wan mêrê bindest ê başûrê cihanê her çiqas li dijî wan (jinên başûr) serdestiyê bike jî di radeya yekemîn de hevalê wan ê têkoşînê bû. Di vir de li ser hev bandorkirina kategoriyên cuda (yên wek cîn, race/nijad, zayend, etnisîte û hwd.) derketin pêş. Nakokî ne tenê bi zayendên “jin û mêr” ve girêdayî bû; di heman demê de rewş, şert û mercên wan ên civakî, aborî, cîni, perwerdehiyê bandoreke mezin li ser rastiya wan a -zayenda civakî- dikir.

Di çarçoveya vê şiroveyê û tecrûbeyên jinên kurd de du helwestên din derdikevin pêşberî me: tevgera jinên kurd di navbera desthilatdariyên netewewewletê, civaka bawîksalar û pergala kapîtalîst de têkiliyê yekser, bînavber dibîne. Ev sêgoşe hevûdu xwedî dikin. Lewma jî ji bo wê di navbera desthilatdaran de tu ferq tune ye. Helwesta duyemîn jî li dijî desthilatdaran kurd derdikeve pêş. Wek helwesteke dekolonyal ne tenê li dijî mêtîngêriya netewewewletê, li dijî mêtîngêriya navxweyî jî disekine. Ev mêtîngêrî him di talankirina axa Kurdistanê de, him jî di pêşkeşkirina aqilê spî/serdest de derdikeve der.

Tevgerên dekolonyal di serî de ji bo mafê axaftinê/gotîne têdikoşin (Spivak). Lewre zimanê wan, hebûna wan jî wan tînin girtin, lal dimînin. Û jî wan re tê gotin “hûn wek bindest nikarin biaxivin.” Hemî têkoşîn li ser daxwaza bîdestxistina mafê axaftinê dimeşe. Di vê çarçoveyê de pîrsa “kî dikare li ser navê kê, çi bibêje?” wek pîrsa li muxatabê xwe digere derdikeve pêş. Mohanty wek mînak axaftina “serdestên (spiyên) gelên bindest” jî red dike. Li gorî wê kesên bijarte (priviledged) jî netewewewlet/zayend/etnisîteyên bindest jî nikarin li ser navê bindestan biaxivin. Piştî têkoşîna bi dehan salan kurdên bindest bûn xwedî ziman. Jin bûn xwedî ziman. Xwe û xwebûna xwe pênase dikin. Paradigmayê xwe li ser vî esasî, li gorî hebûna xwe, sazî dikin. Bi taybetî rexneya li “desthilatdarî” û “netewewewlet”ê wek teşeya axaftina vê tevgerê derdikeve pêş. Ev axaftin nema bîdeng dibe û şûn de vedigere.

Teoriya medyaya femînîst II



Linda Steiner

Rojnamegerî hê jî gîredayî çanda xwe ya berê ye. Bi taybetî jî li navenda nûçeyan çanda mêrbûnê didome, li vir nêzikatiyên kesên an jî baweriyên kesên pir zêde girîng nayên dîtî.

Di teoriya medyaya femînîsttan de hîpotozek heye: Heke jin medyayê kontrol bikin, dê naverokê cuda û baştir bibe. Li vir nêzikatiyêke femînîsttan heye ku pejiwandîneke bavîksalarî red dikin. Bi wî awayî dê jin di bin rêveberiya jinan de zêdetir roleke afrîner û erênî bilîzin. Her wiha di weşangeriyê de jin û mêr (ji hevûdu cudatir) wê bibin xwedî tarzeke rêveberiyê. Bi taybetî jî di rojnamegeriyê de angaştek hebû ku mêr piranî bala xwe didin ser nûçeyên giran û bi vî awayî jî çavdêriya mêran zêdetir derdixin pêş, li dijî vê nêzikatiyê jî jin bi taybetî bala xwe bidine ser nûçeyên ku jinan eleqeder dikin û piranî jî çavdêriyên jinan derbixin pêş. Li gorî pêdiviya temaşevanên jî li ser xeta etîk û exlaqê naverokê jî nû ve biafirînin. Li vir di hêla îzahkirinê de pênaseyên li ser her du cinsan tînin kirin pênaseya teoriya femînîzma çandî ye ku li gorî vê teoriyê jin jî mêran jêhatîtir in. Ev jêhatîbûn jî bi taybetî di kar û xebatên medyayê de xwe dide xuyakirin. Jin jî mêran guncavtir xebatên medyayê dikin. Romy Frohlich (2004), di nav fikaran de ne ku taybetmendîya jinan a xwezayî wek civakîbûn, empatî û hwd... dibe ku potansiyela jinan a kar û xebatê sînodar bike.

Di dîrokê de cudahiyan ku di navbera jin û mêran de hene tim li ber çav bûn. Ji derveyî hin cureyên rêzefîlman (soap opera an jî pembe dîzî) û magazînan, jinan di medyayê de cih negirtibûn. Lê gava ku jinan bêtir di qada televîzyon, film û rojnamegeriyê de cih girtin û xwe nîşan dan ji aliyê hêlê teorîsyenan ve hat destnîşankirin ku di navbera xebata jin û mêran de cudahî nîne. Ji bo pênasekirina

vê rewşê jî fizîknas li ser tîgehekê disekinin. Girseya krîtîk (critical mass), di fizîka nûkleerê de ji bo pêdiviya reaksiyoneke nûkleer a domdar dabeşkirina materyalan e ku vegera vê kirariyê nîne. (Dahlerup, 2006) Cara ewil jî siyasetmedar û karsaz vê tîgehê bi kar tînin. Li vir xalek heye ku şîrketên mezin dibin êdî ji asteke şûnde kar û xebatên xwe bi xwe didomînin û hewcedariya wan a veberhênanê namîne. Li gorî vê teoriyê jî heke nûçegihanên jin bikaribin xwe bigihînin asta 'girseye krîtîk' ew ê zêdetir bikaribin mafên xwe bi dest bixin.

Balkêş e ku teoriya girseya krîtîk, di nav hin kesên de dibe sedema metirsiyê. “Heke jin bi awayekî serkeftî tev li kar û xebatên medyayê bibin, ew ê destheqê daxînin û jî hêla naverokê ‘nermtir’ ve jî dibe ku zirarê bidin rojnamegeriyê.” Hincetên bi wî awayî jî dibe ku jinan di nav kar û xebatên wek hevşîretî, sekretêrî û hwd. de bifetîsin. Ew jî jinan tenê bi kar û barên berstûka penbe (pink-collar) an jî pembe yakalî an jî gettoya penbe ve sînodar dike. (Beasley & Theus, 1988) Îhtîmaleke mezin vegotina gettoya dêmî (velvet ghetto) jî bo qadên wek tîkiliya gel zêdetir di cih de ye ku di hêla hejmaran ve jin zêdetir li van deran xuya dibin. Ji bo xuyakirineke bi vî awayî jî çend sedeman nîşan didin. Dibe ku mêr naxwazin di karên wiha de bixebitin an jî jî hêla mêran ve jin jî bo xwedî statûyêke mezin nebin hatibe qebûlkirin û hwd... (Toth & Cline, 1989) Bi her du awayan jî ev rewş wek çerxeke

bêsûd derdikeve pêşiya me, daxistina heqdestgirtinê û statûyê ew ê mêran jî kar dîr bixe. Metirsi ew e.

Li gorî lêkolînan, di navbera her du cinsan de cudahiyan biçûk hene. Li gorî anketeke di hêla berîdaniya pişeyî de di navbera jin û mêran de zêde cudahiyan girîng tune ne. Berovajî jin hîn zêdetir berê xwe didin kar û xebatên curbicur (Weaver & Wilhoit, 1996; Weaver, Beam, Brownlee, Voakes, & Wilhoit, 2007).

Di varyasyoneke din de jî guherîn tenê di nav rêveberên asta wan bilind de çêdibe. Ji nişka ve guherînek wiha jî tenê di nav mêran de dibe. Jin di rêveberiya bilind de cih nagirin û tim di rêveberiya navîn de dimînin. Lê balkêş e ku xebatên sazîyên medyayê yên jinan zêde dişibin yên mêran (Ferguson, 1990). Berê ferastek hebû, wexta di payeyên bilind de cih bigirin ew ê hêzeke xurt bi dest bixin lê Qralîçeya Bîrîtanîyayê, Margaret Thatcher, edîtoriya rojnameyên bi nav û deng û hwd. ev feraseta berovajî kirin.

“Piraniya edîtorên jin ên di qadên meroke/mêran de cih digirin ji bo statûyên xwe di nav gumanekê de ne û heta niha di hêla serkeftîbûyîna bazirganiyê de li ber mêran nesekinîne. Bi gotîneke din heta niha li ber pozê hev nesekinîne. Pîvana serkeftinê bi rêzgirtina mêran ve yan jî bi xwişk û birabûnê ve mirov nikare bipêve.” (Ferguson, 1990)

Heman tişt jî bo rêveberê giştî yê The News International Rupert Murdoch jî derbasdar e ku di navbera salên 2005-2007’an de navê wî bi

şantaj û bertilê derketibû û li ser vê bûyerê îstifa kiribû. Ev bûyer jî bo Rupert Murdoch jî wek hilweşînê pêk hatibû. Ji aliyê din ve ev bûyer hem li ser dayikên malê ne hem jî dayikên xebatê gelek tiştan dibêje. Jinên rojnameger jî di navbera wan de qala şer dikin û li ser hewldana wan a mêrbûyîne jî pir zêde tiştan nabêjin. Dijberî vê, jin li hemberî hev çirokên awarte diweşînin û li dijî feraseta femînîzmê jî reklamên çêdikin.

Rojnamegerî hê jî gîredayî çanda xwe ya berê ye. Bi taybetî jî li navenda nûçeyan çanda mêrbûnê didome li vir nêzikatiyên kesên an jî baweriyên kesên pir zêde girîng nînin ku nêrîna mêran bi vî awayî di nav kar û xebatên de didome. Li gorî Liesbet Van Zoonen (1998) ê, jin exlakeke cuda tercîh dike.

“Rojnamegerên jin wiha difikirin ku jî mêran zêdetir ji bo pêdiviya xwendevanên xwe rêzê digirin. Û mêr di bin navê bîalîbûnê de weşeta xwe vedîşêrin. Jin bi dilovaniya xwe nêzikatiya mêran biçûk dibînin.” (Ferguson, 1990)

Niha rojnamegerên jin her çiqas xwe ji fikra “kar û xebatên me ji ya mêran cudatir e” dîr bixin jî dibe ku di esasê xwe de zêdetir li gorî nêzikatiya edîtoriyayê naveroka xwe hilbijêrin. Bi gotîneke din jî hêla edîtoran ve dibe ku tiştên wek hîtabên jinan dikin, binivîsin (Chambers, Steiner ve Fleming, 2004).

Jin an wê xwe wek nivîskar derbixin pêş an jî derfetê bidin ku bila wekî ‘xwe’ bikaribin bixebitin.

Têbînî: Ev nivîs ji îngilîzî hatiye wergerkirin.

Li Kilyosê bi kes jî bêkes kirine

Navenda Nûçeyan

Kesên nasnameyên wan diyar in û ruxseta wan a definkirinê heye jî li peyarêya goristana Kilyosê veşartine. OHD, dê veşartina cenazeyan a li peyarêyê bibe NY û DMME'yê

Di pêvajoya vîrusa koronayê de ji aliyê hikûmetê ve li dijî kurdan êrişên dijwar pêk hatin. Destpêkê di meha adarê de çend şaredariyên HDP'ê desteserkirin û şûna hevşaredaran qayûm tayîn kirin. Piştî vê desteserkirina vîna kurdan, di meha nîsanê de li hemberî goristanên zarokên kurdan ên di demên cuda de ji yana xwe ji dest dabûn jî êriş pêk hatin û li gelek bajarên goristan hatin hilweşandin. Cenazeyê Egît İpek bi kargoyê ji malbata wî re hat şandin. Piştî di meha gulanê de di çend şaredariyên HDP'ê hatin desteserkirin û qeyûm şûna hevşaredarên HDP'ê hatin tayîn kirin.

Weke ku ev êriş ne bes bin, derket holê ku cenazeyên zarokên kurdan ên ku di 19'ê kanûna 2017'an de ji goristana Xerzanê ya li gundê Oleka Jor a Bedlîsê hatibûn dizîn, li Stenbolê li peyarêya goristana Kilyosê ya Bêkesan hatine veşartin. Li gel ku heta niha dihat zanîn ku 267 cenaze hatine dizîn jî bi rapora Sa'ziya Tiba Edlî (ATK) ya Stenbolê derket holê ku 281 cenaze hatine dizîn û ji van tenê 21 cenaze radestî malbatên wan hatine kirin.

Parêzer dê serî li NY û DMME'yê bidin

Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwez (OHD), piştî derketina holê ya bûyerê, li goristana Kilyosê lêkolîn kir û têkildarî mijarê raporek amade kir. Endamê OHD'ê parêzer Serhat Çakmak, di nav hefteyê de der barê raporê de axivî. Çakmak, diyar kir ku xebatên xwe yê hiqûqîyên tekildarî mijarê didomînin

û amadekarî dikin ku veşartina cenazeyan a li peyarêyê bibin Neteweyên Yekbûyî (NY) û Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME). Çakmak, da zanîn ku di rapora xwe de daxwaz kirine cenazeyan bidin xwediyên wan û der barê kesên berpirsîyar de jî lêpîrsîn bê destpêkirin.



Cenaze li ser hev in

Ji bo cenazeyan 18 gorên komî li peyarêya goristanê hatine çêkirin û hemû cenaze li van 18 gorên komî li ser hev hatine veşartin. Cihê cenaze lê hatine veşartin 3 metreyan kûr hatiye kolandin. Li ber cihê ku cenaze lê hatine veşartin xebata kanalizasyonê hatiye kirin û ji ber ku ev xebat nivco hatiye hiştin, borî bi awayekî berbiçav tîn xuyakirin. Di dimênên dema veşartinê de tê dîtin ku qabên plastîk ên cenaze tê de ne çawa avêtine ser hev.

Derket holê ku li peyarêya goristana Kilyosê cenazeyên ruxsetên wan hene jî hatine veşartin. Dozgerê Komarê yê Tetwanê angaşî kiribû ku

goristana Xerzanê ne goristan e û cenazeyên li wir hatine veşartin ne diyar e cenazeyên kê ne. Lê li gel vê yekê jî gelek malbatên cenazeyên zarokên xwe li goristana Xerzanê veşartibûn ruxseta veşartinê standibûn. Yek jî van malbatên ruxseta cenazeyê kurê xwe girtiye malbata Serhat Arslanargun e.

Dengê xerab nabin xwe

Serhat Arslanargun, di sala 2014'an de li Kobanê di şerê li dijî DAİŞ'ê de jiyana xwe ji dest dabû û cenazeyê wî anibûn navçeya Pirsûsê ya Rihayê. Malbata Arslanargun, cenazeyê kurê xwe Serhat bi belgeya "Ji bo definkirin û neqilkirinê tu astengî tune ye." Girtibû û li goristana Xerzanê ya Bedlîsê veşartibû. Bi hinceta ku testa DNA'yê ya Arslanargun bi dawî nebûye cenazeyê wî jî li peyarêya goristana Kilyosê veşartine.

Xwişk Arslanargun Rojbîn Arslanargun, anî ziman ku li gel di destê wê de belgeya destûra definkirinê ya cenaze heye jî cenazeyê birayê wê nadinê û wiha got: "Me belge û ruxseta definkirin û neqilkirina cenaze ji ATK'a Rihayê girtin. Li gel ku em vê belgeyê pêşkêşî ATK'a Stenbolê û Dozgeriya Komarê ya Tetwanê dikin

Mirî jî wek zindiyan rastî cudakariyê tîn

Seroka Weqfa Mafê Mirovan a Tirkîyeyê (TÎHV) Prof. Dr. Şebnem Korur Fincancı, veşartina cenazeyan a li peyarê nixand û diyar kir ku derxistina cenazeyan a ji goristana Xerzanê û veşartina wan a li peyarêya goristana Kilyosê binpêkirina mafên mirovan û sûcê îşkenceyê ye. Fincancı, da zanîn ku hemû cenaze ne bê nasname ne û wiha got: "Li Tirkîyeyê mirî jî wekî zindiyan rastî cudakariyê tîn. Kesên jiyana xwe ji dest didin jî ji ber nasnameya xwe rastî cihêkariyê tîn. Êrişên li dijî cenaze û goristanan, di rastiya xwe de êrişa li dijî malbat û xwediyên cenaze û goristanan e."

jî tu fêdeya wê tune ye. Ji bo em rapora otopsiyê bistînin, me serî li Serdozgeriya Komarê ya Rihayê da. Lê 8 meh derbas bûn hêj tu bersiv nedane me. Ji ber ku me encam negirt, serî li Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê da û me xwest gora dayik û bavê min vekin û minaka DNA'ê bigirin. Lê mixabin heta niha Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê jî tu bersiv nedaye me."

Jiyana bi hev re û aştî zor e!

Xwişk Arslanargun, da zanîn ku cenazeyê wan ne bêkes e û ev tişt anî ziman: "Em van tiştên tînin serê cenazeyan qebûl nakin. Dewlet dixwaze hafize û koka me tune bike. Ji ber vê yekê êrişî gor û goristanan dikin. Em heta mirinê jî vê yekê ji bir nakin. Cihê cenaze lê defin kirine ne goristan e. Cihê sergo û çop e. Li wê peyarêyê tenê hestiyek bimîne jî em heta dawî tîbikoşin. Heta ku hurmetê ji miriyên mirovan re nişan nedin, jiyana bi hev re zor e. Heta ku cewherê demokrasîyê fêm nekin aştî jî zor e."

Li Kerboranê 40 kilox hatin dîtin

Navenda Nûçeyan

Di salên 1990'î de li bajarên kurdan bi hezaran bûyerên faîlên wan ne diyar pêk hatine. Di van bûyeran de zêdetirî 15 hezaran mirov hatine kuştin û windakirin. Gelek kesên hatine windakirin hê jî agahî ji wan nayê girtin û kesên jiyana xwe ji dest dane jî cihê cenazeyên wan nayê zanîn. Li gel ku ji bo hînbûna aqûbeta windayan, her hefte çalakî tîn lidarxistin û xizmên wan daxwaza edaletê dikin jî tu pêşveçûn çênebûye.



Ji salên 2000'î vir ve li hin deveran bi awayekî tesadufî hestiyên kesên wîndayî hatine dîtin û xizmên wan bi vî awayî aqûbeta wan hînbûne. Bajare herî zêde mirov lê hatine windakirin û hestî lê hatine dîtin Mêrdîn e. Heftaya borî di çend bajarên de awayekî tesadufî li şikefteke mezraya Libka Kaniya ya gundê Derêca yê navçeya Kerboranê ya Mêrdînê hestî hatin dîtin.

Çûyîna şikeftê hat qedexekirin

Welatîyê bi navê İrfan Yakût ku bavê wî Yahya Yakût jî di sala 1993'an de hatiye windakirin, gora komî dît û ji bo lêkolînê serî li Serdozgeriya Komarê ya Mêrdînê da. Piştî serlêdana Yakût Serdozgeriya Komarê ya Mêrdînê, li şikefta ku hestî lê hatibûn dîtin, lêkolînê kir.

Ji ber lêkolînê heta demekê destûr nayê dayîn ku kes derbasî şikeftê bibe û hestiyên bibîne.

Beriya destpêkirina lêkolînê Yakût ê der barê gorê de serî li dozgeriyê dabû, bi parêzerên Komeleya Mafê Mirovan (İHD) a Şaxa Mêrdînê re çû cihê bûyerê. Lê dozgeriyê destûr da ku tenê Yakût derbasî cihê bûyerê bibe. Di lêkolînê de hat tespît kirin ku di nav hestiyên hatine dîtin de 40 kiloxên mirovan hene.

Lêpîrsîn nepen e

Piştî lêkolîna li şikeftê hat kirin, hestî kirin kîsan û birin Edliya Kerboranê. Hat ragihandin ku dê hestî ji vir jî ji Sa'ziya Tiba Edlî (ATK) ya Stenbolê re bînin şandin. Der barê lêpîrsîna jî bo mijarê hat destpêkirin de jî biryara nepeniyê hat dayîn.

Yakût ê ku lêkolîna hat kirin di cihê şopand, diyar kir ku bavê wî Yahya Yakût di sala 1993'an de hatiye windakirin û wiha got: "Berê jî em li herêmê digeriyan lê me hestî

nedîtin. Di 28'ê gulanê de dema ku em di çûna herêmê digeriyan, li pêşîya şikeftê me hestî ferq kirin."

Hêviya hestiyên salên 1990'î

Yakût, da zanîn ku wî bi gumana ku hestiyên bavê wî jî di nav hestiyên hatine dîtin de hebin serî li dozgeriyê daye û ev tişt anî ziman: "Min serî li dozgeriyê da, niha hestî girtin û wê bişînin testa DNA'yê. Çi dibe bila bibe derketina holê ya vî tiştî wê ji bo herkesî bi xêr be."

Serokê Şaxa İHD'ê ya Mêrdînê Fevzi Adsız ku destûr nehat dayîn biçê herêma bûyerê jî bi lêv kir ku ew di wê fikrê de ne ku hestiyên hatine dîtin hestiyên kesên di salên 1990'î de hatine windakirin û wiha got: "Dibe ku hestiyên hatine berhev kirin hestiyên kesên di çarçoveya Doza JÎTEM'ê ya Mêrdînê ya li Semsûrê berdemaw dike de hatine windakirin bin jî. Beriya niha hestiyên 7 kesên hatibûn dîtin lê hestiyên 3 kesên nehatine dîtin."

Pir

Şengul Ogur

Berêvariya havîneke Nisêbînê weke tabloyeke ji destê resamekî derketî, xwe berdaye ser pîrê.

Ava Çemê Binûsra di bin pîrê de sekinî maye, naheke. Tirêjên rojê li ser piştê ava çemê diçirsin. Li qiraxên çemê bi dehan req serê xwe ji qêlik derxistine, kom bi kom, xwe dane ser kevîran û bi bêdengî, bêlîv û tevger li senfoniya beqan guhdar in. Siha qîfarên hişkbiyî yê ku bejneke rabûne, ketiye ser ava çemê, kulîlkên bi sitirî yê qîfaran li ser avê bi zelalî xuya dibin. Dengê zingîla bi stûyê kehrîkekê ve, dengê dîkan, çelekan tevî xalaxala zarokên bajêr bûne û deng bi hev re bi ser bajêr hîlbûne.

Bêhna axê, bêhna giyayê hişkbiyî, bêhna dara biyê, qajê, ya tuyê, ya hejîrê ji berêvariya bajêr difûre. Çend çûk bi rengên sor û şîn û gewr ên ezmên ve aliqî mane, li jêra çend ewrên biçûk.

Li bakurê rojhilatê pîrê xwe daye ber siha dara biyê û li pîrê dinêre; li pîra ku şeniyan bajêr navê 'Pîra Şehîdan' lê danîne. Bi rengê wiha li pîrê dinêre mirov dibêje qey ne li pîrê lê li nav çavên mirovêkî dinêre. Yan jî weke ku pîrê re bûye eynik û ew jî di pîrê de li xwe dinêre û di neynikê de geh dema niha dibîne, geh jî dema bihurî û geh jî dema wê bê.

Sê lingên pîrê yê weke stûnan bi xwar ve çûne, pîr jî nivî ve bi hêleke xwe ve xwar bûye, weke ciwanekî ku piştê wî şikestibe, nikare xwe rast bike, bi pêş ve tewiyaye û sekinî maye. Devê pîrê ti nemaye ku bigihîje ava çemê. Mirov dibêje qey pîr li ava sekan a çemê û di ava sekan a çemê de li ezmên dinêre, li çûkan û weke ku gaveke di wê kabên xwe bide ber xwe, rabe ser xwe, serê pîrê li ezmên bikeve.

Hema wê gavê bi carekê re dengê radyoyê ingilîz jî salên 90'î di guhê wî de olan dide:

"Li gorî saloxan li ser pîreke bajêr bi dehan mirov hatine kuştin, gelek şeniyan bajêr jî bo neyên kuştin xwe avêtine çemê û di çemê de xeniqîne."

Hê dema ku ev deng di guhê wî de olan dide, dengê eynî radyoyê jî beriya pênc salan di guhê wî de olan dide:

Hê ev deng di guhê wî de ye, dengê eynî radyoyê jî beriya pênc salan di guhê wî de olan dide:

"Pîra ku salên 90'î bi dehan kes li ser hatibûn kuştin, ji hêla berxwedêrên bajêr ve hatiye firandin. Ewa demek e ku berxwedêr jî bo Xwerêberiyê li ber xwe didin."

Bi dengê tirkî yê anonsekê, ku piraniya şeniyan bajêr jî wî dengê fêhm nakin, ji nav dengê radyoyê şiyar dibê: Ji ber vîrusa Covid-19'ê qedexeye ku mirov derkevin derve.

Zilamê kalê bi rojan dihat ber dara biyê, heta ku tari dikete erdê û nema xuya dikir dêhna xwe dida ser pîrê, weke ku xatir ji hevlekî xwe xwestibe destê xwe ji pîrê re hildaye, lêvên wî lebitîne, weke di ber xwe de bibêje, "Ez ê di çavê bêm û em ê civata xwe bidomînin."

WEK RUSTEMÊ ZAL GURZÊ MIN TUNE LÊ QELEMA MIN HEYE

Hevpeyvîn bi xortekî 70 salî re

→ Firat Cewerî

Îsal sedsaliya Musa Anter e. Heke ne ji belaya vîrusa coronayê biya wê li hin bajarên welêt sedsaliya Musa Anter bi şahî bihata pîrozkirin. Lê ji bo em rewşên bîrê xwe yê şareza ku di sala 1992an de bû hedefa guleyên hovan bi bir bînin, em vê hevpeyvîna berî bi 30 salî diweşînin. Piştî deh salên sirgûnê cara pêşî seriyekî vegeyriyabûm cih û warê xwe û hingî ev sohbet bi Musa Anter re kiribû. Bi riya vê sohbetê, mirov hin aliyên Musa Anter ên taybet jî nas dike. Kerem bikin:

Cara pêşî, di sala 1978an de ez bi çend hevalên xwe re çübûm Stilîlê, mala Mûsa Anter. Ji wê çaxê de vî camêrî bala min kişandibû. Lixwekirina wî, rabûn û rûniştina wî, tevgera wî, nefspiçûkahiya wî, hizir û ramanên vî ronakbîrê nûjen tesîreke pir erênî li ser min hiştibû. Wî hingî jî me re behsa astronomiyê, felsefê, medeniyeta girêkiyan, dîmê Zerdest û dîroka mirovatîyê kiribû. Lê romantîkbûna wî jî ji ber çawan nerevîyabû. Estetîka baxçê wî, dar û gulên wî yê têvel, cihokên di hewşê de çêkirî û tijî masiyên cûr-becûr, Mûsa Anter bi sed salî jî gundiyan bi dîr dixist. Lê digel wê zanebûn û nûjenbûna xwe jî, Mûsa Anter tu carî xwe ji gundi û mirovên xwe bi dîr nedixist; kul û derdê wan, êş û jana wan, kêf û şahîya wan bi xwe re par ve dikir. Bi sed salî di pêşîya wan de bû, lê mil di mil de, bi wan re dimeşîya.

Min Mûsa Anter piştî serîhildana Nisêbînê, di nehê tîrmeha 1990î de dîsan dît. Di ser re tam donzêh sal buhurî bûn. Salên wî ghiştîbûn heftêyî. Min di serê xwe de Mûsa Anterê kal, ku nikane bimeşe, nexweş, bi êş û elem û xurîfî çêdikir. Lê ne wîlo bû. Ew bi her awayî wek xortekî bû, xortekî 70 salî...

Bi bawerîya ku wê jiyana vî xortê 70 salî ji bo hevvelatîyên min balkêş be, min xwe negirt û jê pirsî:

Çi bigire îro navê Mûsa Anter ji aliyê hemû kurdan ve tê zanîn, nemaze ji aliyê kurdên Tirkîyê ve... Hin kes wî wek nivîskarekî, hin kes jî wî wek siyasethavakî dizanin. Gelo tu bi xwe wî çawan didî naskirin?

Ez dikarim bibêjim ku ez nivîskarekî siyasî me. Heta ji min hatiye jî, min xwestiye ez siyasethê bi awayekî mîzahî bikim. Ji ber ku heta niha me firsenda em bikaribin fikir û ramanên xwe eşkere û vekirî bibêjin, nedîtiye, min ji xwe re riya mîzahê neqandîye. Nivîskarê Hindî jî wîlo kiriyê. La Fontaine jî di dema xwe de siyaseta Fransayê bi heywanan, yanî bi fabel îzah kiriyê. Mirovên min, der û dora min kurd in; دنیا min Kurdistan e. Kurdistan jî perîşan e. Ez bawer im ger ez ne kurd bûma jî, min ê dîsa li ser kurdan binivîsanda.

Ji bilî xebatên te yê siyasî, ez te bi Qimil, Bîrîna Reş û ferhenga te nas dikim. Ji bo çî te hewcedariya nivîsandina wan pirtûkan dît? Kê tu ajofî ser vî karî?

Yê min ez ne silahşor bûm. Tu ordiyên min jî tunebûn. Ji ber ku min neheqî qebûl nedikir min hewcedariya nivîsandina wan pirtûkan dît. Şairekî amawîd heye, dibêje: Mirov di bin lingan de be jî, divê mirov bibêje wîlo ye, xebara min e. Gerçî ez jar bûm, ez yekî bi tenê bûm. Eyb e ez bibêjim, lê ez dikarim bibêjim ku piştî Cumhûriyete min dest pê kiriyê. Ez ne poşman im. Hin bi hin hevalên min li min gîhan û niha yê ku ez derbas kirime jî hene. Mirov her dixwaze ku lawê mirov jî mirov çêtir be. Niha ez dibînim xortên kurdan dest avêtine vî karî, pir kêfa min tê. Di dema me de xortên

xwende kêma bûn, çî bigire tunebûn. Li Nisêbînê kesên ku biçûna dibistana navîn û lîseyê tunebûn, ez bi tenê bûm.

Vêca fêda min ya herî mezin ew bû, ku pir jî malbata me, mala apê min ew, hemû li binxetê bûn. Havînan gava ez ji mektebê dihatim, ez diçûm Sûriyê. Li wir Hawar derdiket, Ronahî derdiket, ez di bin tesîra van kovar û nivîskarên wan, wek Celadet Bedir-Xan, Kamûran Bedir-Xan, Cegerxwîn, Qedrî Can û Osman Sebrî de mam. Tu ya rastî bixwazi, meraqa min jî ji nivîsandinê re pir hebû, ji ber vê yekê min dest pê kir û min xwest ez wê valahiya ku heye dagirim.

Wek tê zanîn tu wek nivîskarekî aktif di pir kovar û rojnameyan de xebitîyî. Tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtî behsa wan kovar û rojnameyan bikî?

Jiyana min ya weşanê, di sala 1948an de, li Stenbolê dest pê kir. Hingî me »Dicle« derdixist. Piştî ew hat girtin, me di sala 1950 de kovareke bi navê »Şark Mecmuası« derxist. Piştî hatina qaşo demokrasiyê, ez vegeyriyam welêt. Li welêt ez dîsan nesekekim, me li Diyarbekirê »Şark Postası« derxist. Piştî wê bi çend salekî ez ji bo eskeriyê dîsan çûm Stenbolê. Bi dû xelaskirina eskeriya xwe re gava ez vegeyriyam welêt, îcar me di sala 1958an de »İleri Yurt« derxist. Piştî derxistina İleri Yurtê, me çapxane kirî û me dest bi weşandina »Mezopotamya« kir. Derketina »Mezopotamya« bû sedema girtina me. Ji sala 1958an heta 60î ez girtî mam. Gava ez hatim berdan, min di kovara Ahmet Akif Başar ya -li Stenbolê derdiket- de nivîsand.

Baş e, di ser derketina wan pirtûkan re demeke dirêj derbas bûye. Ew dema dirêj di ser kovar û rojnameyên ku tu bi wan re xebitî ye jî derbas bûye. Tiştê ez dixwazim bibêjim ev e; bi salan tu xebatên te xuya nekirin. Ji bo çî? Sebeba ku te nenivîsand çî bû?

Min nivîsand. Pir kes jî bi vê yekê dizanin. Çar kitêbên min yê ku ji bo çapê amade bûn, hebûn. Herçar kitêb jî ji aliyê polîsan ve hatin girtin. Yek ji wan kitêban ferhengê bi kurdî û tirkî bû. Yek jî jî bi navê »38 Numaralı Hücre« bû. Navê kitêbekê jî wîlo bû »Diyarbekir wê şevê çiqasî reş bû« Min biranînen xwe jî nivîsandine, ew niha jî çapê re amade ne. Ez hêvîdar im ew ê jî niha û demeke nêzik berpêşî xwendevanan bibe.

Wek tu dibînî ez nesekinî me, tiştê jî destê min hatiye min tewsîr nekiriye.

Ji bo çî tu ji Stenbolê vegeyriyayî, te xwe ji jîyan û hewayê entelektuelî bi dîr xist û tu li gund bi cih bûyî?

Ji 1970 û heta 75an ez sî û sê mehnan girtî mabûm. Piştî ez hatim berdan ez hebekî nexweş ketim û ez tîra xwe jî westiyabûm. Ez hewcedarî bêhnberdanê bûm. Min xwe li gund baş rehet kir. Vê yekê heta 1987an dom kir. Di 87an de ez careke dînan rabûm sergovendê, min dîsan dest bi nivîsandinê kir.

Ez ê jî te re çîrokeke Rustemê Zal û bavê wî bibêjim. Hin Rustem zarok bû, bavê wî rojekê bang dikiyê û dibêje were lawo, ez ê vê şerîeta xwe, karê xwe hemûyî bispêrim te. Dijmin bi vê yeka han dihese, tê ser wan û li talanên wan dixê. Hatîn ji Rustem re gotin, dijmin li talanên me xistin. Rustem got, tişt nabe, me jî li talanên wan xistiye. Paşê hatin gotin, kuro bi şerîtanê konê me ketine, konan bi ser me de xerab dikin, dîsan got, tişt nabe, me jî konên wan bi ser wan de xerab kirine. Dawiya dawî hatin gotin, heyran dest davêjin namûsa me. Hingî Rustemê Zal hêrs bûye, gotiye, îcar nebû, ka hespê min û gurzê min ji min re bînin. Rustemê Zal xwe avêtiye ser piştê hespê xwe û bi hêrs



û rik li hemberî dijmin rabûye.

Yê me jî li me xistin, îşkence bi me kirin, bawer bike gundiyan me hemî bi daran ve girê dan û tiştên nemayî anîne serê wan, rezalet kirin, zarokên me hemû girtin, kezeba me şewitandin, me deng nekir. Heta êdî gûyê me dane me, dest avêtin namûsa me, şerefa me anîn perakî. Wê çaxê min nema xwe girt. Yê min tu gurzê min wek yê Rustemê Zal tuneye, lê qelema min heye. Niha min rahiştîye qelema xwe û min bi vê kaltiya xwe xwe avêtiye meydana şer.

Di vê meydana şer de pir xort jî hene ku hespên xwe dibêzînin. Me bîstika dîn li ser nişê kevin, yanî nivîskarên der û dora Hawarê sohbet kiribû. Heke tu nişê nû û nişê kevin bidî ber hev, çî ji nişê nû de dikeve serê te? Tu, tu hêviyê di nişê nû de dibînî an na?

Yên berê hem hindik bûn, hem jî kevin bûn, yanî klasik bûn. Lê xortên niha, an jî nişê niha moderntir in. Nivîskar dibe, şair dibe, her kes li gorî kultura xwe dinivîse. Mesele yê kevin, pir ji wan ne xwediyê kultureke kûr bûn, di medresan de, bi xwendina dînî ghiştîbûn. Rebenan negeriyabûn, nedîtîbûn. Cegerxwîn li Qamişlokê dinivîsand, hûn li Swêdê dinivîsin, ferq ev e.

Îro kêma zêde mirov dikare behsa zîmanekî kurdî yê standart bike, an jî behsa edebiyateke kurdî. Wek tu jî dizanî, îro bi zîmanê kurdî roman, helbest, lêkolîn û heta em dikarin bêtir ku nivîsên felsefî jî derdikevin. Lê piraniya vî xebatê li derveyî welêt dibe. Rola vî xebatê han di têkoşîna gelê me de çî ye? Ger li welêt îmkane vî xebatê çê bibe, wê pêşketin xwe bi çî awayî nişan bide?

Rola vî xebatê ya hêja û giranbuha nayê mînaqêşekirin. Ma kî bêtir tiştên wîlo dikarin bi ser bikevin? Edebiyat, an jî nivîs riya têkoşîna rohnî dike. Lê mixabin, zîmanê me hê ewçend bi pêş neketiye. Heta zîmanek nekeve warê nivîsandinê, ew zîman bi pêş nakeve. Niha her kes wek malbata xwe dipeyivin. Anîha ku jinek were gund û zarokê jê re çêbibe, ew zarok wê ne wek gundiyan, lê ew ê weke diya xwe bipeyive. Ji ber vê yekê ye ku zaravayên me pir bûne, ji hev bi dîr ketine. Ez bawer im gava zîmanê kurdî tekeve warê nivîsandinê, ew ê dîrbûna zaravayên kurdî roj bi roj nêzîktir bibe. Em û zaza û soran em ê bikaribin bi hêsani jî hev tîbigihên, ew ê bibe zîmanek. Tiştêkî dîn jî heye ku em kurd jî her kesî bêtir birçiyên ilim û nivîsandinê ne. Niha, gava yekî tîr û yekî birçî li ser sifreyekê rûnên, ma ew ê mîna hev bixwin? Yê me jî wîlo ye. Ger kurmançî serbest bibe, em bikaribin çapxane û weşanxaneyên xwe li dar bixin, em ê di demeke nêzik de li pêşîya cîranên xwe bixin. Ez bi xwe di vê baweriyê de me.

Çi ji siyaseta Tirkîyê ya îro dikeve serê te? Şiyarbûna kurdan di çî dereceyê de ye?

Li Tirkîyê ebeden siyaseta ilmî tuneye. Qeşmerî heye. Ew bi xwe jî dizanin ku êdî bi yasaxan, bi girtin û îşkence ev kar naçe serî. Ew jî mecbûr in xwe biguherin. Ji aliyê din ve jî em kurd şiyar bûne.

Min di dema xwe de çîrokek di »Dicle Kaynağı« de nivîsandibû. Hingî ez hatim girtin, li min xistin, îşkence bi min kirin, gotin, kuro tu kî yî, tu çî teba yî? Em ê serê te bipelçiqînin. Axirê piştî hezar zehmetiyên gava ez hatim berdan min dîsan nivîsand. Kurteçîroka min wîlo dest pê kiribû: Jinek, zilamek û zarokêkî wan ê çar-pênc salî hebû. Ew karker bûn, jin û mîr di xew de bûn, lawikê wan jî razayî bû. Lê gava diz dikevin hundir, lawik şiyar dibe. Yek ji dizan diçe li ser serê lêwîk dîskine, kêra xwe dikîşîne û dibêje: »Deng jî te derkeve ez ê te bikujim.« Dizê dîn jî diçe sindoqa diya wî dişkinê û hemû fîraxên wê dixê kîsekî. Kezeba lêwîk dişe-wite, lê ma wê rebeno çî bike, kêr jî di ser serê wî re kişandiye. Ji bo lawikê dî û bavê xwe şiyar bike, bang dike, dibêje: »Avinê, avinê, avinê!« Yek ji dizan dibêje: »Hiş be kuro!« Yê dîn jî dibêje: »Tiştêk nabe lawo, zarok e, tirsîyaye, hinek av bîdiyê«. Ew tasek av didê lêwîk. Gava lawik avê vedixwe, dîsan jî bo dî û bavê xwe şiyar bike, bi dengêkî bilind dibêje: »Ooox, ooox, ooox« yanî av çiqas xweş e. Lê dî û bav dîsan şiyar nabin. Yê diz destê xwe bilind dike û dibêje: »Hiş be kuro! Ez ê kulmekê li devê te bixim ha!« İcar lawik bi dengêkî bilind bang dike, dibêje: »Ay devê min! Ay devê min! Ay devê min!« Hingî dî û bavê lêwîk şiyar dibin û diz jî direvin. Min jî got »Lawo, ez dizanim ku ez wek wî zarokî me, kêr di ser serê min re ye, ez nikarim bi we û dî û bavê min jî razayîne. Armanca min ew e ku ez wan şiyar bikim.

İcar niha dî û bav şiyar bûne, dilê min rehet e. Di destên dizan de bi tenê rev maye. Dîr an nêzik ew ê birevin.

Şîret û pêşniyarên te ji karkerên kulturê yê derveyî welêt re çî ne?

Ez xebata we ya li derveyî welêt gelekî dicibînim. Mesele Jon Tirkan jî li Ewropayê karê xwe dikirin. Gandî li İngiltereyê, Ben Bela li Fransayê xwe gihand. Em jî hêvîdar in ku hûn ê rojekê vegeyriyên, li welatê xwe xwedî derkevin û karîna wê tîxine destên xwe.

Divê hûn tu carî bêhêvî nebin. Tarîxa miletan dirêj e. Va ye emrê min bûye heftê, min xwe nas kiriyê ez di nav vî xebatê de me, min hê jî bi qaşî qîrşekî tiştêk jî hêviya xwe wîna nekiriye. Tiştên ku hûn dikin pir bi qîmet in. Belkî niha xatirê wê nayê girtin, lê wê rojekê bê, ev hemû tiştên we nivîsandine, wê mîna beyreqan li ba bibin.

Nisêbîn, 1990

Margarîta Borîsovna Rudenko

Aysel Tabak



Rudenko heta dawîya jiyana xwe jî xebatên xwe yê zanistî domand. Wê bi tîgîhêştîneke kûr, bi jîrbûn, bi enerjîyeke bêdawî kedeke bêhempa daye ji bo edebiyat, çand û hûnera kurdî û ji 350 zêdetir berhem afirandiye

Êdî eşkere ye ku di warê lêkolînê kurdolojîyê de rola zanyar-kurdologên Rusyayê gelek girîng e. Xebatên zanyarên Rusyayê yê kurdolojîyê hê di sed-sala 19'an de dest pê kiriye. Zanyarek navdarê vê serdemê Avgus (Aleksandr) Jaba ye. Wî gelek berhemên kurdî yê dest-nivîsî berhev kirine. Di nav van de dest-nivîsên berhemên Ehmedê Xanî jî hebûn. Xebatên Jaba dê bibûna bîngê ji bo damezirandina kurdolojîya Rusyayê û de gelek zanyar li ser berhemên wî berhev kirine bixebitiyana û her wiha M. Rudenko jî yek ji wan e. Helbet Jaba kesê ewil nebû ku li ser kurdan û kurdî xebitîbû. Lê heta wextê xwe xebatên herî girîng û bi bandor ya wî bû. Qanatê Kurdo di berhema xwe ya bi navê "Tarîxa Edebiyata Kurdî" de dibêje ku lêkolînerên ewropî yê rojhilatnas hay ji literatûra kurdan nebû. Bi xebatên Jaba re û piştê jî bi kurdologên Sovyetê û bi taybetî bi M.B. Rudenkoyê dinya pê dihesse ku ne tenê edebiyata kurdan heye, her wiha literatûreke wan a gelek dewlemend jî heye.

Rudenko kî ye?

Ez bawer im xwendevanên edebiyata kurdî kêm zêde wê nas dikin. Wê di jiyana xwe ya kurt de ji bo çand, dîrok, edebiyat û etnografyaya kurdan kedek mezin daye, divê her kurd wê baş nas bike û bizane. J.S. Muselyan di nivîsa xwe ya li ser rûpela Kêtabxana Lenîngradê (Peterburg) de radigihîne ku di sala 1960'an da di semînerê Zanîngeha Ermenistanê de zanyarek ermenî wiha gotiye: "Dê rojek were gelê kurd peykera wê deyne." Lê wê bixwe abîdeya xwe bi xebatên xwe yê bêhempa daniye.

M.B. Rudenko di sala 1926'an de li Tiflîsê hatiye dinê. Bavê wê zimanzan û dêya wê pîyanîst bû. Zaroktiya xwe li Tiflîsê derbas dîke piştê malbata wê koçî Petersburgê dîke. Wexta Şerê Cihanê yê Duyemîn dest pê dîke ew bi dêya xwe re vedigere Tiflîsê lê bavê wê li wê dimîne û di dorpêça Lenîngradê de jiyana xwe ji dest dide.

Piştî şer diqede M. Rudenko dîsa vedigere Petersburgê û di Zanîngeha Petersburgê de, di beşa Rojhilatnasiyê de li ser zimanên îranî dest bi xwendina

xwe ya zanîngehê dîke û di sala 1951'î de diqede. Hê di dest-pêka xwendina xwe de dersên çand û zimanê kurdî yê Q. Kurdo didan, bala wê kişandibû. Teza xwe ya parastîne bi mijara "Di kurmanciya modern (nûjen) de lêkerên şertê" pêşkeş kiribû. Teza Rudenkoyê jî komîteya parastîne qîmeta herî bilind distîne. Ku di vê komîteyê de Q. Kurdo û serokê kafetrayê Bugoyubov hebûn. Ev gaweke girîng bû ji bo rêwîtiya wê ya ber bi kurdolojîyê ve. Wexta dest bi aspiranturiyê (mastir) kir Ehmedê Xanî û berhema wî "Mem û Zîn" bala wê kişand. Teza xwe ya aspiranturiyê li ser Mem û Zîna Ehmedê Xanî amade kir. Bi serkeftî parastina teza xwe kir. Di wê demê de rojhilatnasê rûs Orbellî ku beşa kurdolojîyê jî li Sovyetê damezirandibû wiha dibêje: "Ji bo Ehmedê Xanî sempatiya min di 43 saliya min de çêbû û ez gelek kêfxweş im ku jiyame heta min dît helbestên Ehmedê Xanî bûne mijara tezek zanistî."

Cara ewil berhema Ehmedê Xanî "Mem û Zîn" li zimanekî biyanî, li rûsî hatibû wergerandin. Wergera bi qasî sê hezar beytên hûnerî û feylesofî bi ramanên kûr, tîjî kînyayê û alegorî zanyariyek bêhempa diviya li ser zimanê farisî erebî û kurdî. Rudenkoyê bi serkeftî vî karê giran biribû serî. Zanyarekî wekî Hartman jî ber kûrî û giraniya berhemê wergera wê red kiribû û Rudenko di vî warî de bibû zanyarê ewil.

Di heman wextê de Rudenko bi dest-nivîsên li Kitêbxana Dewletê ya Petersburgê ya A. Jaba berhev kiribû dihesse. Di sala 1957'an de danasînek li ser dest-nivîsarên A. Jaba yê Kitêbxana Devletê de hat weşandin. Ev xebat jî bo gelê kurd gelek girîng bû û Rudenko di nav rewşên bîrê kurd de gelek navdar bû. C. Bedirxan piştî vê xebatê

jê re nameyek dişîne û wiha dibêje: "Ev xebat deriyê xezîneya Kitêbxana Peterburgê vekiriyê".

Piştî vê xebata girîng M. Rudenko dîsa vedigere ser Ehmedê Xanî. Lê ev xebat jî teza wê ya mastirê bi temamî cuda bû. Esasa vê xebatê berhevdanên



neh dest-nivîsên berhema "Mem û Zîn"ê û nirxandin û şîroveya wegerê bû. Ev xebat bala gelek zanyarên Sovyetê kişandibû gelek kes xwestin wergera Ehmedê Xanî bikin. Lê kesî nekarîbû vê daxwaza xwe bibe serî. Xebatên Rudenko perdeya li ser edebiyata kurdî ya serdema navîn rakiribû. Wê berhema Feqiyê Teyran "Şêxê Senan", ya Xarîs Bedlîsî "Leylî û Mecnûn" bi şîrove weşandibû. Xebata wê ya bi navê "Versiyona helbesta kurdî ya edebî û folklorî "Yûsif û Zelîxa" piştî mirina wê di sala 1986'an da hate weşandin.

Di meha nîsana sala 1970'yan de li Zanîngeha Erîvanê konferansê "Edebiyata Kurdî ya Serdema Navîn" çêdibe. Xebatên M. B. Rudenkoyê di vê konferansê de ciyek taybet digire. Konferans dikete pey şopa edebiyata kurdî ya kilasîk a serdema navîn a bi Elî Herîrî destpê dîke (S. XI) û bi Ehmedê

Xanî diqede (S.XVII-XVII). Di semînerê de 350 dest-nivîs cî digirin. Ev semîner her kesî bi dewlemendiya edebiyata kurdî heyirî dihêle û ev jî bo lêkolînê kurdî dê bibûya wesîle.

M. Rudenko tenê di warê ziman û edebiyatê de nexebitiye. Mijarên xebatên wê gelek berfirêh bûn. Ew di heman wextê de bi pîrgirîkên gelê kurd ên sî-yasî, etnikî û çandî re jî mijûl bûye. Mijarên wek "qederê kurdan, dîrok, cejn û pîrozbahî, ser-sal û dîroka kurdan" di berhemên wê de cî girtine.

Gelek caran çûye cem kurdên Ermenistan, Gurcistan û Azerbaycanê. Li van deran gelek materyal cevandine. Ji sedan zêdetir berhemên wê yê derbarên çand, hûner û folklorê kurdî de hene.

M. B. Rudenkoyê heta dawîya jiyana xwe jî xebatên xwe yê zanistî domand. Wê bi tîgîhêştîneke kûr, bi jîrbûn, bi enerjîyeke bêdawî kedeke bêhempa daye ji bo edebiyat, çand û hûnera kurdî û ji 350 zêdetir berhem afirandiye. Herî dawî kitêbên "Yûsif û Zelîxa", û "Helbestên Ayîniyên Kurdî" amade kiribûn. Ev perhem piştî mirina wê hatin weşandin. Rudenko di pêncsalîya xwe de çû rehmetê. Lê li pişt xwe kurdologên gelek hêja hiştin. Koma kurdologên Petersburgê niha jî xebatên xwe didomînin û gelek zanyarên heja tê de cî digirin. Yek ji wan jî Jaklîna Musaelyan e. J. Musaelyan di sala 2014'an de berhemek li ser xebatên M. Rudenkoyê ya bi navê "M. B. Rudenko, Oçerkî Sered-nevekovoy Kurdskey Literatûrî" berhemek weşandiye. Di berhemê de xebatên Rudenkoyê yê dest-nivîsên folklorîk berhev kirine û pêşgotîneke berfirêh der barê M.B. Rudenkoyê de nivîsiye.

Gelek berhemên Rudenkoyê li ser rûpela kitêbxana Akademiya Zanistî ya Rusyayê ya Petersburgê hene û her wiha mirov dikare xwe bigihîne xebatên kurdologên din jî.

Tara bêjîngê

Ciwan Qado

Li bin zerdika dilme a roka deştê, jînikan kêr û meqes li bin tara bêjîngê di navandin û di dest xwe re tara bêjîngê jî bi guliyekê ji werî-sekî mû rêsandî dîgerandin, piştê zarok li ser wekîndreke çênî datanîn û ew peşk bi peşk jî çilê wî didizîn û direvandin dî dawî çil kefçî av dixistin tasa çilî de û bi ser wî de dadikirin û di ber re weha digotin û dibilandin:

Çilê binê erdê, ê ser erdê

ê heywanan, ê însanan

ê mar û mişkan, ê dîpîşk û kêzîkan

ji bistê vî zarokê derxîne xwedêya.

Jixwe heya zarok dibû 40 roj jî her şev gepek nan, meqesek û kêrek dixistin bin serê wî. Dêya min yek ji wan kesan e ku heya roja me ya îroj jî van bawerî û ritûalan pêk tîne, sînda dawî jî li ba wê bi agir e, bi ezmanê jor û deqa rokê ye û ku yekî me jê re dibêje: yadê, tu çima bi Xwedê sûnd naxwî...tu dizanî ev bîr û bawerî ji çerx û dewranên pût-perestiyê ne, hin ji wan jî jimîrasaêzdayetiyê ne? Diber xwe re dikene û dibêje: Erê, ev baweriyên me kurmancanî law, me wilo xwe dîtîye û em ê wilo ji bimirin.

Wek nihate bîra min, şev û rojên çarşeman serê me nedîşt. Şevên pêncşeman jî neynûkên me jê nedikirin û pîrre caran rojên serşuştina me disparte semî û yekşeman û dema xwe ji şîwa me re radipêça, meqesek û kêrek bi kinçekî me dinuxumand, paşê ew dixistin teştê û digot "ji bo win nederibin law,, Dengê guregura paporê û sîkên reşok di serşokê de heya niha wek nexşên nivîsîna destpêka tarîxê li ser dîwarê şikefta serê min dibiriqîn.


Ev edet û nerîtxwerû wek lîstok û yarîkên zarokan dixweyin, wek kulmeke biwêj û nişe ji çîrok û çîvanokên pîrikan firar bûbin, an wek ku hinekan ew bi dizî jî hilma însanê pêşîn kesixandibin berî kitêbê çêbilin û li ser piştê nezanan pîroz bibin û hilkişin ezmanan.

Bi çêbûna me re û berî ku zarokpeyva „dê“ pê re derkeve, ev ritûal bi mîrasa bedewiya pûtperstî hê medîsrê, ev efsaneyên prîmitîf û sade di meqamê pêşîn dedîkor û xişla zimanîne, kurmên ku bêhna axa ziman derdixin dûrî darizandinê zanistî û olîku li her tiştî bi çavê bikaranîn û rêbazan dinêrin. Heger mirov bi dîrbîna ziman li wan binêre û ev merema min e jixwe, dê ev ritûal wekhevalbîçûkêndêrîn û veşartî ênzîmanê me xuya bikin, zimanê me ê wek eqîq û kevirên bihagiran ku DAYÎK-nîfîş bi nîfîş ji keçên xwe re, di nav desmalên bi tawisan nexîşandî de, hiltînin.

Demeke dirêj di bin navê nûjeniyê de, nûjeniya ku dinya ji ser qîloçên ga peyakir û ew weke xarekê di bîrika desthilatdaran de werkir, dinyaya gewrik ku li hejar û bêilacan dibê wek tara bêjîngê, bêjînga em li ser tazî û vedayî bi çil kefçî av bûn kurd, gellean ev ritûal bi kevirê pêşketîna sexte recim kirin wek çawa bikarhîner û bawermendên van ritûalan jî bi şeytanperestiyê sûcdar kirin. Bi tebşîrê li dora wan xêz dikirîbî dî re bi zîkê xwe digirîtin û wek deveyan hêç diketin û xwe di erdê didan.

Di heyama zaroktiyê de mirovekî tîhbihî-neû mirûztal hebû, bîna mîska wî di terefê toto re derdiket, li bayê çûn û hatîne weiz û şîret li me zarokan dikir. Carekê piştî ku cerçûrên şîretên xwe di serê me de vala kirin, ji me re got: Kêr û meqes ji çî re ne, guh nedîn van pûçbawerîyan, divê roja malûm de gelek hene devgirêdan ji wan re divê, hebîbê Xwedê ser piştê heywanekî jî ker mezintir û ji qantir biçûktir û riwê wî di çehreyê pîrekeke can de ye, firiyaye ezmanê hefta û li wir yekser çûye şevbuhêrka pêximberan û dîsa di heman şevê de vegeyîyaye malê. Di nav her çend gotinan re diçû û dihat û digot: Erê ka min li ber bixînin, kêr û meqes ji çî re ne?

Wê çaxê bersiva minasib li ser zimanê me rûnedîşt, niha mintê derxist bê ew kêr û meqes ji çî re bûn: Meqes ji bocarê em pê porê mê ewî heywanê firok kur bikin û kêr jî ji bo em qîvarê ji nivê wî ê di şîbhê ker- qantir de, biqêşîrin.



'Fîlozofê xwezayê' Apê Mûsa

Ramazan Olçen



Sala 2020'an her çiqas di hafizaya civakên li vê dinyayê wê cihêkî xwe yê mustesna tune be jî, jiyana bi awayekî dibe. Vîrusa koronayê, şer, pevçûn, xizani, birçibûn, mirin, êş û azar, helbet hindik be jî car bi car şadî û bextewarî hebana sala 2020'an bi ewqas hest û dilnê hê devedev tîjî bû. Yekûn û barekî belkî jî mirovahî nikare rabike hemû ketin nav salekê ku ev sal hêj dawî lê nehatiye.

Dema em zarok bûn û dinya têra xwe mezin bû illa me rêyekê peyda dikir ku em xwe bi xwe sebra xwe bînin. Hema em jî nav malê direviyan ber bi baxçeyan ve. Ne bi tenê em direviyan hevalên me gîş direviyan. Ji ber ku jiyana, ziman, tevgera mezinan em aciz dikirin (îro em jî mezin in û jiyana, ziman û tevgera me zarokên me aciz dikin ku ev paradokse mezin e).

Em li derve hîn bûn. Em li derve bûn civak, me bi listikan hev nas kir û xwe nas kir. Îcar ez ê li vir behsa kesayetekî bikim ku ew wî zarokê di nav dilê xwe de ti carî ne-

hişt mezin bibe. Ez ê li gorî xwe hinek behsa Apê Mûsa bikim. Apê Mûsa wî çinarê mezin îsal bû 100 salî. Te dî ji bo edîban, hunermendan, siyasetmedaran van salrojên qerase bi seremoniyên tîn xemilandin. Îcar her çiqas bi seremoniyek ne be jî em nîfşa sisêyan a çapemeniya kurdî bi minnetdarî vî felyesof û xwezahezê kurd yad dikin.

Ew bi serê xwe pireyek e di navbera nîfşa yekem û nîfşa sêyem de. Ew hafizayeke xurt a çapemeniya kurdî bû jî. Di hebana û tûrikê wî de li kêleka mewijkên tore teqez hin peyv û gotinên devê me pê şîrîn dibû jî hebûn. Wî ti carî zimanê xwe neherimandibû. Zimanekî welê ku dema pê li hemberî 'dijmin' jî diaxivî, bi wan gotinan zimanê serdest lal dikir. Bersivên welê dida ku 'mezin-serdest' şaş û metel dima.

Li yewnana antîk beriya serdema feylefosiya fermî serdemek heye û hin kesayetên wê serdemê hene ku sere xwe bi bûn û bi beridîna bûnê ango hebûnê êşandine. Ji wan re dibêjin feylesoyên xwezayê. Ew kes bûne hîmê felsefeya cihana rojavayî. Îcar Apê Mûsa hem feylesof û hem jî xwezayî bû. Ew serê xwe ji bûn û hebûnê wêdatir li ser armanca hebûnê ango li ser azadiyê

diêşand. Îcar ne li ser azadiya şexsî jî li ser azadiya qewmekî ku hê jî di çavê serdest û mezin de 'lanetiye' dinyayê' tîn dîtin.

Em îro roj bi minetdarî wî bi bîrtînin û hewl didin ku bi layiqî li ser şopa wî û hevalên wî bimeşin. Em

gelek caran xwe bi xwe jî mitale dikin û dibêjin, em ê zimanê serdemê çawa biafirînin, em ê rêwiye rîya felatê çawa zêde û xurt bikin. Ziman, nuktedanî, moral, motîvasyon têra xwe li cem Apê Mûsa dibe mamûl. Ma ne gotine: "Şev ti carî

ne rip î reş e." Em çiqas bikaribin rêpivana wî esas bigirin, ango em çiqas bikaribin xwe bigihînin û yê di hebana xwe de bikin malê gel û parve bikin, em ê ewqas hebûna xwe nêzi azadiyê bikin. Yan na di bûnê de mayî hinekî jî genîbûn e.



Reşbûn çavên jiyane. Mîna tûdirkan dibiriqîn. Du çavên mîna kaniyek avzê ji ken û coşê dibiriqîn li ser rûyê wê yê heyva çardeşevî li ber teşe girtûbûn û şahidiya navê wê dikirin li her kêliya demê. Jiyana herikbar bû mîna av û bayê. Zindî û ciwan, bedew û xweşik, ya herî delal bû li taxa me.

Navê wê li ser zimanê her kesê digeriya û di hemû kêliyên demê de min herî zêde navê wê dibihîst. Vê yekê dibiht ez zêdetir bala xwe bidim Jiyane û wê nas bikim. Neh salî bûm û Jiyana pîrsek mezin bû di hişê min de. Ji ber tevî hemû ciwaniya wê, reşbûn cilên Jiyane. Ji çavên hemû zarokên min nas dikir reşbûn. Mirovan bextê jinan û cilên Jiyane dişibandin hev û vê nepeniya di navbera wan de mereqa min dida ber şemaqan. Çima reşbûn cilên Jiyane? Têkiliya di navbera reşiya cilên Jiyane û bextê jinan de çibû? Bext çî bû, ma diviya sor, zer, spî, gewr an kesk û şîn be? Gelo ger cilên Jiyane ne reşbûya wê rengê bextê jinan çî bûya? Jiyana jinek bejin



Reyhan Îke

Jiyane nekujin!

zirav û bilind, reng genimî, rûken, nazik û nazdar bû. Lê reşbûn cilên jiyane û jinan bextê xwe dişiband rengê cilên wê.

Min nedizani çima hemû jin gazindan ji Jiyane dikin. Hema hemû jinan li gel xwedê gazind ji Jiyane dikir û behsa nebaşî û nexweşiya wê dikir. Lê Jiyana jinek tendurist, li ser xwe, gurc û jêhatî bû. Kenê wê wekî kullîkên pîvokên li zinaran geş bû, heyîna wê reng û ciwaniyek cuda dida taxa me. Lê hema hemû jinan digot, "xwedêyo, ev çî Jiyana e te kirî para me?"

Jiyana hêj di zarokatiya xwe de bê bab mabû li gel du xwişk û birayekî xwe. Bi zori û zehmetiyan mezin bibû, bibû jinek ciwan.

Paşê ji ciwanekî delal ê taxa me hez kiribû, bi hev re zewicibûn. Piştî zewaca wan bi salekê şûn de kurekî wan çêbibû. Sê meh bi ser çêbûna kurik re derbas bibûn qêrînek ket taxa me. Jiyane xwe kuşt! Jiyane li mala xwe, xwe bi werîsekî ve kiribû û xeniqandibû. Lê herkesê digot qederê wisa kiriyê. Vê carê dayika wê jî destê xwe ber bi jor ve radikir û digot; "xwedêyo, ev çî Jiyane te kirî para min" û ji her çavê wê sulavek rondik dibariyan li ser termê Jiyane.

Min qeder nas kir paşê. Qeder bibû kujera Jiyane. Herkesê vê carê berê tîrên awirên xwe dabûn qederê. Jin, zilam, hûr û giran şahidiya kujeriya qederê dikirin. Jiyana û qeder bibûn wekî nav û paşnavên hev. Yek bi ya din dihat gotin. Qederê Jiyana kuştibû, lê hê jî bextê jinan reş bû li gorî gotin û gazindan dikirin. Ji aliyekê ve qeder kujer îlan kiribûn, ji aliyekê ve herkes li qederê xwedî derdiket û bi devê xwe digotin 'ev qedera me ye.' Gelo ger qeder a wan be, ew jî nedibûn şîrikê wê yê kuştina Jiyane? Qederê bi gotina kê kiribû, ji ber çî Jiyana kuştibû? Ma ne wan bi xwe digot qeder ya Jiyane bû jî. Ma ger qeder a Jiyane be jî çawa dibe ku Jiyane bîkujer? An qeder ne ya Jiyane bû, an jî ne qederê Jiyana kuştibû.

Lê ferman hatibû dayîn. Di kujeriya qederê de herkes hemravan bû. Lewma pêdivî bi pîrsên din nebû. Pîrsên mîna gelo Jiyane çima xwe bi dar ve kir? Kî û çî bû sedem? Çî derdên wê, kul û janên wê, pîrsgirêkên wê yê bîcare hebûn? Qeder hem kujer bû, hem jî herkes lê xwedî derdiket û digot, "qedera me ye." Ger qeder kujer be çima herkes li qederê xwedî derdiket?

Heta mezin bûm jî van pîrsan qet hişê min terk nekir. Paşê pê hesiyam ku qeder 'bizina gunehan' bû. Herkesê barê gunehên xwe li qederê dikir û bi vî rengî jî dojeha wijdana xwe direviya. Lê min wê demê nedizani Jiyana ez im, tu yî, em in... Min nedikarî bîjim qeder nezaniya me, neşiyarî û xemsariya ci-

vaka me ye. Min nekarî ji kesê re bîjim bi kuştina her jinekê Jiyana dimire. Em dimirin û navê mirina me, kuştina me dibe qeder. Min nedikarî bîjim, JIYANÊ NEKUJIN!

Li ser vê çîroka bi jan a zarokatiya min re gelek sal derbas bûn. Lê mixabin îro jî li Kurdistanê dijminahiya jiyane bi dawî nebûye. Dewletên dagirker herî zêde jinên kurd dikin armanc û êrişî jinan dikin. Nûnerên pergala zilamsalariyê yê wekî AKP-MHP û DAIŞ'ê herî zêde êrişî jinan dikin. Kuştin û çewisandina jinan wekî egera hebûna xwe dibînin. Çawa berê bi navê 'Namûsê' jin didan kuştin, îro jî di bin navê 'terorîstiyê' de jinan dikin armanc û hewl didin pêşiyê li ronakbûn û zanebûna civaka kurd bigirin. Ji ber baş dizanin ku havênê hiş û ramana azad a civakan jin e. Civaka jina wê zana, azad û xwedî vîn, li hember ti desthiliyê serî natewîne. Lewma her êrişî li ser jinan tê kirin, divê civaka me wekî êrişî li ser jiyana, rûmet, azadî û pêşeroja xwe bihesibîne. Dewleta dagirker a tirk bi sedhezaran mirovên me kuştin û navê kuştina wan kir 'kuştinên fail nediyar.' Lê fail diyar e û em dizanin ku dewleta tirk kujer e.

Çawa em îro dizanin dewleta tirk kujer e, em bi saya têkoşin û berxwedana bi hezaran jin, ked û berdêla bi hezaran dayikên kurd ên zarokên xwe li ser pîvan û exlaqê azadiyê, bi wijdan mezin kirin dizanin ku navê kuştin û mirina me jî ne qeder e. Di encama wê ked û berxwedana mezin, têkoşina dijwar de em îro dibêjin em ê hesabê her kuştinê bipîrsin. Em bi wê dikarin ji dagirkeran re bîjin tu dagirkerî, ji zaliman re bîjin tu zalim î, ji yê navê kuştina me dikin qeder re bîjin tu derewker î, ji yê bi nêzikatî û sekna xwe kuştina jinan a di her warî de erê dikin, ji kujeran re dibin alîkar û xizmeta politikayên kuştina jinan dikin re bîjin tu kujer î. Bi pêxistina zanebûna xwe, xurtkirina rêxistina xwe, bihêzkirina vîna xwe em îro dikarin xwedî li azadî û rûmeta xwe derkevin.

Lewma neyarên me herî zêde êrişî jinên pêşeng, zana, xwedî vîn, xwedî pîvan û exlaqê azadiyê dikin. Lewma divê em bizanin ku mezinkirina têkoşina azadiya jinê, xwedîderketina li jiyane ye. Li dijderketina her awayê zilm û zorê pîvana bi exlaqbûn, wijdanbûn û mirovbûnê ye.



Hişyariya pêla duyemîn

Her çend li cihanê vîrusa koronayê (Covid-19) belav dibe jî gelek welat gav bi gav tedbîran radikin. Li aliyê din hişyariyên girîng li dijî rakirina van tedbîran tên kirin. Rêxistina Tenduristiyê ya Cihanê (WHO) li dijî pêla duyemîn hişyar kir

Navenda Nûçeyan

Li cihanê vîrusa koronayê (Covid-19) hê jî belav dibe. Her çend heta niha dermanê vîrusê nehatibe dîtin û çareserî peyda nebûbe jî, gelek welat gav bi gav derbasî pêvajoyeke asayî dibin û tedbîran radikin. Rêxistina Tenduristiyê ya Cihanê (WHO) li dijî rakirina tedbîran û derbasbûna jiyana asayî hişyariya pêla duyemîn dike. WHO balê dikişîne ser xeteriyê û dibêje: "Dibe di vîrusê de lûtkeya duyemîn pêk bê." Dîrektore Bernameya Rewşên Lezginê e WHO'yê Dr. Mike Ryan di rojên borî de, diyar kir ku li gelek welatan vîrusa kêm bûye lê hê jî li Amerîka, Başûrê Asyayê û Afrîkayê vîrusa pêl bi pêl belav dibe. Ryan di axaftineke xwe ya bi rojnâmeya The Guardianê re vê yekê jî dibêje: "Dibe vîrusa niha kêm bibe lê divê mirov xwe ji bo pêla duyemîn amade bike." Daneyên kesên bi koronayê ketine û kesên jiyana xwe ji dest dane yên li welatên mîna DYA, Rûsya, Spanya, Îtalya, Fransayê, Îngilistan û hwd. vîrusa ku WHO balê dikişîne radixe ber çavan. Li DYA'yê hejmarê miriyan zêde dibe û zêdetirî 100 hezar kes jî vîrusê canê xwe ji dest dane. Li Îngilistanê jî 38 hezar mirov canê xwe ji dest dane. Yek ji welatên niha herî zêde jî vîrusê bi bandor dibe, piştî Amerîkayê Brezîlyaya ye. Li gorî daneyan heta niha li tevahiya cihanê 6 milyon kes bi vîrusê ketine, 363 hezar kes canê xwe ji dest dane, 2 milyon û 600 hezar kes ev vîrus derbas kirine û hê nêzî 3 milyon kes jî jî vîrusê zirarê nebûne. Li gorî vîrusê tabloyê, li Tirkîyeyê jî heta niha zêdetirî 161 hezar kes bi vîrusê ketine, nêzî 4 hezar û 500 kes canê xwe ji dest dane, 124 hezar kes jî derbas kirine. Niha jî zêdeyî 32 hezar kes bi vîrusê ne û zêdeyî 680 kes jî rewşa wan krîtîk e.

Hişyariya WHO'yê

Li gel vîrusê xeteriyê û hişyariya WHO'yê gelek welat ji ber sedemên ku di serî de rewşa aboriyê hewl didin

Bi dehan girtî nexweş in

Piştî vîrusa koronayê li girtîgehên belav bû, li Girtîgeha Sîlvriyê di 22'ê gulanê de girtiyekî canê xwe ji dest da. Serdozgerê komarê yê Bakirkoyê di 8'ê gulanê de diyar kir ku li Sîlvriyê 44 girtî bi vîrusa Covid-19'ê ketine. Dozgeriyê piştî aşkere kir ku li Girtîgeha Tîpa L ya Hejmar 7 a Sîlvriyê, 47, li Girtîgeha Tîpa L ya Hejmar 8 a Sîlvriyê 35 bi giştî 82 girtî bi vîrusa Covid-19'ê ketine. Dozgeriyê da zanîn ku diktoran 72 girtî kontrol kirine û 10 girtî jî li sazîyên tenduristiyê tên dermankirin.

Têkildarî mijarê Endama Lijneya Navendî ya ÎHD'ê Nûray Çevîrmen, anî ziman ku heta niha 40 girtîyan jî Girtîgeha Sîlvri bi rêya malbatan serî li wan daye. Çevîrmen bal kişand ser rewşa girtiyên nexweş jî û wiha lê zêde kir: "Li girtîgehê girtiyên kal û pîr û girtiyên nexweş pir in. Kesên serî li me didin beşek ji wan bi nexweşiyên kronîk in. 8 kes jî bo testa vîrusa koronayê îsrar kirin û di 6 kesan de vîrus derket. Kesên vîrus bi wan re derketiye bêyî wan têxin karantînayê dîsa dişînin qawîşên wan."



jiyanê asayî bikin û wekî ku vîrusa koronayê diqede didin nîşandin. Dewletên bi van polîtîkayên xwe dixwazin tedbîrên heyî rabikin jiyana mirovan jî nedîtî ve tên. Dewleta Tirkîyeyê jî bi heman şewazê tevdiqere û hewl dide di vîrusê de sektora turîzmê zindî bike ku aboriya xwe ya binkefî hinekî lextekê lê bixe. Di hişê her kesî de ev pirs heye: "Gelo dewlet dê heta kengî hejmarê kesên bi şewbê ketine, ên pê dikevin û yên dimirin vîrusê?"

Dewleta Tirkîyeyê herî dawî aşkera kir ku ji 1'ê heziranê û şûnde de cihên wekî cafe, restoran, parq, mîzegeft û hwd. bînan vekirin. Lê li aliyê din jî de ew qedexeya ji bo kesên temenê wan 65 û bi jor de berdewam be. Her wiha ragihand ku qedexeya ji 0'ê heta 20 salîyan jî daxist heta 18 salîyan. Li aliyê din jî bo malbatên dixetbin destûr da ku qirêş bînan vekirin, de û bav zarokên xwe deynin qirêşê. Ev nakokiyekê derdixe holê. Heke derketina zarokan a derve qedexe be û hê jî

ev xeteriyek be de malbat çawa zarokên xwe deynin qirêşan.

Rewşa li girtîgehên

Rewşeke din jî ew e ku bi qanûna derxistin re gelek girtiyên sûtê li dijî civakê kirine hatine berdan lê li aliyê din jî bi hezaran girtiyên nexweş û yên li gorî Saziya Tiba Edlî nikarin di girtîgehên de bînin jî nayên berdan. Ev bê hiqûqî û cotstandartîya dewletê rastî nerazîbûnên tûnd hat. Niha bi hezaran girtî bi taybetî jî di vîrusa koronayê de di şertên dijwar ên dijîmirî de dijîn. Li girtîgehên alav û amûrên parastinê yên wekî rûpoş, lepik û dezenfektanê bi peryan difiroşin girtiyên an jî qet nadin wan. Gelek girtî bi vîrusê ketine û yên canê xwe ji dest dane jî hene. Lê belê dewlet guh nade bertek û nerazîbûnên saziyên parêzvanên mafên mirovan û girtiyên.

Herî dawî ÎHD'ê Wanê û TUHAY-DER'ê, li girtîgehên Tîpa T û F yê Wanê bi boneya xetereya vîrusa koronayê çûn serdana girtiyên. Her du saziyan rapor amade kir û li avahiya ÎHD'ê Wanê bi raya giştî re parvekirin. Serokê ÎHD'ê Wanê Mûrat Melet xwest girtiyên nexweş demildest werin berdan û wiha got: "Li girtîgehên tedbîrên li dijî koronayê kêm in. Girtîgeh jî bo tenduristiyê baş nayên kontrolkirin. Pêwîst e ji bo lêkolîn û kontrolê heyetên serbixwe biçin girtîgehên û çavdêrî bikin."

Bi mirinê re rû bi rû hatine hiştin

Her wiha Mûzaffer Çakmak (65) û Feridûn Gunbegî (60) yên di Girtîgeha Tîpa T ya Rihayê de ne, her du jî nexweş in. Parêzerê wan Hidayet Enmek anî ziman ku muwekilên wê bi mirinê re rû bi rû hatine hiştin. Enmek diyar kir ku jî ber vîrusa koronayê der barê jiyana muwekilan de bifikar e.

Di pêvajoya Covid-19'ê de lez dan çêkirina HES'an

Dewleta tirk wekî her gavê dixwaze rewşên awarte jî bo xwe bi kar bîne. Di vîrusa koronayê de lez daya talan û wêrana xwezayê. Li ser ax û erdnîgariya Kurdistanê bi dehan bendav û HES tên çêkirin. Yek ji HES'ên tîr çêkirin jî li Geliyê Zilanê ye. Li Geliyê Zilanê berê jî di 14'ê tîrmeha 1930'yan de bi hezaran kurd qetîl kiribûn. 14'ê tîrmehê wekî roja Komkujiya Geliyê Zilanê tê zanîn. Niha jî li ser Geli û Deşti Zilanê dest bi inşaatê Santralên Hidroelektrîk (HES) kirine. Bi taybetî di vîrusa koronayê de lez dane xebatên çêkirina HES'ê. 2 inşaatên HES'ê li ser Geliyê Zilanê, 2 inşaat li taxa Germavê bi giştî 4 inşaatên HES'ê çêdikin. Saziya Sererastkirina Piyasa Enerjiyê (EPDK) jî bo çêkirina inşaatên HES'an ruhest dan. Piştî EPDK'ê di sala 2013'an de rûhsed da şirketan, şirketan xwestibû malbatên li herêmê îkna bikin. Malbatan destûr nedabû û vîrusê gef li malbatan xwaribûn. Şirketan di sala 2014'an de xwest van zevî û axê bikin malê cemaweriyê. Lê gelê herêmê serî li Dadgeha Şewrê da û dadgehê biryara rawestandîna inşaatê dabû. Li gel biryara dadgehê şirket bêyî guh bidin şewba vîrusê HES'an çêdikin.

Xweşkanî



Felemez Ulug

Nexweşiya serdemê nijadperestî ye

Li Tirkîyê dijayetiya li kurdan li yek navendê tê birêxistin. Ev navenda di heman demê de jî nijadperestiya tirk re jî malovaniyê dike, li welat û derveyî welat xwe bi rêxistin kiriye. Ev rêxistin her çiqas bi şîara tunekirina kurdan hatibe avakirin jî, yekem armanca wê xurtkirina tifaqa AKP û MHP'ê ye.

Li Tirkîyê rojev çî dibe bila bibe yekem rojêva vîrusa koronayê antî-kurd tu carê nayê guhertin ji bo wan her tim rojêva sereke tunekirin ango îmhakirina destkeftiyên kurdan e. Di van rojên karantînayê de ev yek bi awayekî hîn baştir hat dîtin. Li seranserî welat bi taybetî jî li bajarên bakurê Kurdistanê gelê kurd bi zilma faşîzma tifaqa AKP û MHP'ê re rû bi rû ye.

Di vîrusa koronayê de zehmet de êrişên li ser şaredariyên HDP'ê û binçavkirina endamên HDP'ê bûyerên ne ji rêzê ne. Ev êriş encama planên navenda vîrusa koronayê antî-kurd in. Ev rêxistina xwe mîna Gladîyoyê bi rêxistin kiriye jî gelek milan ve êrişê gelê kurd dike.

Di van demên dawî de êrişên li ser goristanên gelê kurd, binçavkirina siyasetmedarên kurd û kampanyaya reşkirina HDP'ê bi hev ve girêdayî ne. Faşîzma AKP û MHP'ê jî niha ve jî bo hîlbijartinan xwe amade dike. Her çiqas bi awayekî eşkere ve niyeta xwe bi lîv nekin jî, ev emelên wan bi awayekî eşkere niyeta wan radixe ber çavan.

Erdogan û şîrikê wî Bahçelî yekem mijara li ser mutabiqî dimînî mijara tunekirina kurdan e. Lewma di nevbêra van herdu dijîminên kurdan de, çî nerehetî ango problem çêbibe jî ew di mijara kurdan de xwedî yek fikrê ne. Ji ber vîrusê AKP û MHP di vîrusa mijarê de wek yek partiyê kar dikin.

Di van rojên dawî de ev rêxistina antî-kurd jî bo xwe li herêmê hîn xurtir bike ketiye nav liv û tevgerê. Bi taybetî xebatên xwe di nav civaka oldar de hîn pêştir dixin. Bi fêlbaziyekê ve dixwazin li herêmê civaka oldar durî HDP'ê bixin. Ji niha ve dest bi amadekariya vîrusa fêlbaziyê hatiye kirin. Di vir de pêwîst e rêxistnên HDP'ê û bi taybetî jî civaka kurd li hemberî wan emelên xirab hişyar bike.

Her çiqas di hedefa vîrusa koronayê Gladîyoyê ya li gorî perspektîfên AKP û MHP'ê tevdiqere HDP hebe jî, em jî bîr nekin ku di vir de hebûna civakêkê tê hedefgirtin. Ev êrişên di cewhera xwe de tîgîha nijadperestiya di hewîna jî bo xwe kurdan wek dijîmin dibîne. Lewma êrişên li ser civaka kurd jî li gorî wan rewa ne. Ev fêmkirina teng a tîgîha nijadperestiya ye. Nijadperestî li tevahiya cihanê wek nexweşiyekê ye lewma mirov dikare bîje nexweşiya serdemê nijadperestî ye. Her çiqas hemû neteweyên di xwe de vîrusa nexweşiyê qebûl nekin jî di wan de heye. Mînakên vîrusê hene. Mînaka herî guncaw jî her roj li ber çavên me tê jiyîn.

Li Tirkîyê jî bo gelê kurd bitirsîn ango durî armanca wî ya azadiyê bixin serî li gelek rê û rêbazên cuda hat dayîn. Gelek jî van pir bi eş bûn. Kesên jî vana ders dernexistine niha jî bi avakirina rêxistinên antî-kurd ve dixwazin hebûna kurdan tune bikin.

Rapora Girtîgeha Sîlvriyê: 15 qawîş di karantînayê de ne

Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD); Komeleya Hiqûqnasên Hemdem (ÇHD), Federasyona Komeleyên Piştewaniya Hiqûqî li Malbatên Girtî û Hikumxwaran re ya MED (MED TUHAD-FED), Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwez (OHD), tîkildarî serdana 22'yê gulanê ya li Girtîgeha Sîlvriyê raporek amade kirin.

Di raporê de hat ragihandin ku li Girtîgeha Tîpa L ya Hejmar 7'an a Sîlvriyê, bi 5 girtîyan re hatiye axaftin û jî wan re hatiye gotin ku li qawîşekê 38 kes tên hiştin û kukîk bi wan re heye. Di raporê de hat gotin ku li Girtîgeha Tîpa L ya Hejmar 7'an 15 qawîş di karantînayê de ne û 107 girtî jî bi nexweşiya vîrusa koronayê ketine.

Di raporê de hat diyarkirin ku girtî nikarin bi hêsani malzemeyên paqîjîyê yê şexsî peyda bikin û 2 meh in wan demaxinî revîrê, rojnâmeyan jî nadin wan. Di raporê de hat zanîn ku hin gardiyan rûpoş û lepikên bi kar nayîn, dermankirin û dezenfektîkirin baş nehatiye kirin, guhertina qawîşan kiriye ku vîrus belav bibe û nikarin xwe bigihînin diktoran. Di raporê de wiha hat gotin: "M.F.C. û A.K. jî roja hatine girtin 80 roj in li hucreya yek kesî tên hiştin" û parêzer jî nikarin bi hêsani hevdi-tîne bi muwekilan re bikin."

Divê girtî werin berdan

Di raporê de tê gotin stoka li kantînan kêm e û



tîştên divê bînan kirin tên diyarkirin. Di raporê de hat xwestin ku kelûpelên paqîjîyê radestî girtiyên bînan kirin, paqîjî tîr bê kirin, girtiyên nexweş, extiyar, bi zarok û duçanî bînan berdan, pêşniyarên TTB'ê li ber çavan bînan girtin û raya giştî bê agahdarkirin.

Dr. Abdullah Polat



Rêçên travmayê li diyasporayê

Pirsgirêkên neyînî yên gelek koçberên di sala borî de li diyasporayê dijîn, di nav xwe û endamên malbata xwe de dibin sedema bêserûberiyên mayînde û derûnî. Van dijminatên ji bo civakbûyîna wan, nemaze li ser bingeha welatê lê dijîn, astengî derdixînin. Di lêkolînên zanistî yên vî dawiyê de; nemaze ji zêdetirî nivê penaberên li Almanyayê dijîn îşkence, destavêtin, asimilasyon, sirgûnî û hwd. diyar dikin ku gelek sedemên din ên mîna van, bandoreke neyînî li ser jiyana wan a rojane dikin. Pispore îdia dikin ku negatîfîyên di pêvajoya Asyl (penaberiyê) de derketine, ligel trawmayê û gelek pirsgirêkên derûnî yên din, destnîşan dikin ku ev pirsgirêk her diçe kûrtir dibin. Tê gotin ku trawmaya ew dijîn bi wan sînoard namîne. Lêkolîner diyar dikin, trawma bandoreke neyînî li endamên malbatê û jîngehê jî dike û ji ber vê yekê civakbûneke neyînî dibînin (Rosental / Polat / Kızılhan).

Tirsên ji ber sedemên cuda di kesayetiye de bi cih dibin, dorhêlên ne diyar ên bûyerên ku ji ber sedemên neyînî an neyekser dibin sedema teror, wêranbûn û bêhêvîtiyê. Trajediyeke psikolojîk ên mirovî li jor sedemên trawmaya giyanî: îşkence, kuştin, destdirêjî û destavêtin, hê pir zêdetir in. Ev sedemên din jî hene, wek mînak nexweşiyên lewitî û lêborîna xwezayî. Van behreyên neyînî û kesayetên neyînî carinan bi nediyarîbûnê derdikevin holê. (Polat / Fischer / Flatten hwd.)

Pirsgirêkeke girîng e û divê di warî de bê lêkolînêrîn bê ka psikolojîya kurdan çawa hatiye xirabkirin.

Li gorî raporên herî dawî yên statistîkî, tê diyarkirin ku tenê li Almanyayê milyonek kurd dijîn û ji sedî 80'yê wan bêtir penaberên ji ber zexta dewletê hatine. Di encamê de, rastî ew e ku kurd di sala 1991'î de koma herî mezin a koçberan bû ku li welat dijîn û divê çanda wan bê naskirin. Li gorî vê yekê, tê destnîşankirin ku nasnameya kurd nehatiye pejirandin û ev bandoreke girîng li kurdan dike. Nemaze helwesta wan a neyînî li hember rêxistinên heye ku di gelek waran de çalakiyên çandî, hunerî û siyasî dikin.

Pispore îdia dikin ku gelek pirsgirêkên li pêşberî kurdan rû didin civakbûn û yekbûnê ya bitendurist asteng dike û amajê pê dikin ku divê ew yek zû were çareserkirin.

Tê diyarkirin wekî gelek malbatên cuda yên li diasporayê dijîn, nakokiyên

di nav malbatên kurd de her diçe girantir dibin û ew yek ji bo jiyaneke bitendurist a nîşên din girîng e û di civakbûn û yekbûna wan de tengasiyan diafirîne. Nebûna nexwendinê wekî rehabilitasyonê li dijî birinên psikolojîk ên dewletê, nemaze ji bo kesên wekî penaberên tîn, ji ber şer, îşkence, zordarî û destavêtinê dibin sedema pirsgirêkan. Ev trawmayên paşê dikarin girantir bibin û yên bi awayekî mezin tene ditin, bandoreke neyînî li endamên malbatê û hawirdora wan, nemaze li wan dikin. Bi taybetî di penaberên kurd de, ev bêserûberiyên derûnî, ku di van salên dawî de ji ber posttrawmayê pêşve çûne, di heman demê de li zarokên wan ên li vir jî dayik bûne û mezin bûne jî, bandoreke neyînî dike.

Di nav jiyana kal û pîran a trajîk de tengasiyên sereke ev in:

Zehmetî di xwendin û nivîsandinê de, ciyawazkirin, asimilasyon, şertên xirab ên jiyane, pirsgirêkên aborî yên pêşketî, dûrbûna welat, tecrîd, pirsgirêkên tenduristiya trawmayê, mercên dijwar ên li ser bingeha şer û koçberiyê, dilsoziya malbatê taybetî digel pirsgirêka zimane biyanî; tevî vana dilovani, nîrxên çandî û olî, serbilindî, orf û adet, zewacên tîkildar ên dîr û nêzîk, pirsgirêka nasnameyê, çalakiyên civakî û çandî û girêdana bi axê re hene.

Hin bandorên neyînî yên wan her du hemanan li ser jiyana zarokên wan ev in: astengên li ber pêşveçûna takekesî, tengasiyên di bijartina pişe de, diwariyên di lêgerîna heval û hevjinan de, bêbiryarbûn, berbiçavkirina tîkiliyên civakî, fêrbûn, entegrasyon û bêhêzî.

Pevçûn û qeyranên ji van bandorên wan tîn derxistin wiha ne: ewlehiya taybet, pirsgirêkên nasname û qeyran, bêhêvîtiyê, tecrîda civakî, pirsgirêkên entegrasyonê, hestên sûcdariyê, nakokiyên di ramanên malbatê de, derûnî û derûniya kesane.

Tiştên divê ji bo ciwanên kurd bi awayekî stratejîk werin kirin ev in:

Tedawiya piştî trawmayê, pêşgirtina li tecrîdê, başkirina rewşa jiyane, rehabilitasyon û tîkiliyeke profesyonel a bi zarokên xwe re. Divê saziyên heya bi lezgîni li ser van pirsgirêkan bisekinin û piştgiriya pedagojîk ci-



vakî û psikologan bê dayîn. Malbatên ji xwendina xwe ya çandî dîr dikevin, piştgiriya hewcedariyê ji jîngehê bigirin, nemaze zarokên xwe ji derdora hawirdorên nebaş dîr bixin, balê bikişin ser çalakiyên civakî û çandî.


Bi taybetî, tê destnîşankirin ku pirnegatîfîyên de û bav û kalên wan di paşerojê de tûşî nexweşiyên derûnî bûne ji ber posttrawmayê di şertên jiyane yên pêşerojê de, hê bêtir û tevlihev bûne. Di lêkolîneke dawî ya li ser malbatên kurd de, tê diyarkirin ku trawma şideta malbatê û nakokiyên di nav malbatê de zêde dike û her wiha bandoreke kûr li ser perçebûna malbatê û jiyana civakî ya zarokên wan dike. Trawma bi dayik û bavên ne sînoard e û ew yek dibe sedem ku rewşa malbatê xirab bibe û malbat ji civakê bê parastin û weqtandin. Di vê lêkolînê de tê diyarkirin ku ev tevlihevî astengiyên girîng li dibistanê û jiyana civakî û jiyana zarokên xwe derdixe holê. Ev yek di nav wan lêkolînan de ye ku divê li dijî vê yekê alternatîfêke pir berfireh û bilez were çêkirin.

Disa ev lêkolîna li ser malbatên kurd ên li Almanyayê dijîn ku xwedan gelek travmayan in, derdixe holê ku pirsgirêk giran e. Hem helwesta neyînî ya malbatan a li hember zarokên xwe û jîngehê û hem jî ew qasî qeyrana ku zarokên wan tê de tecrûbeyek dikin bi eşkere xwe nîşan didin. Di vê lêkolînê de, ya ku diyar dike ku de û bav jî ber ezmûnên xwe di malbatê de nûnertiya xwe wînda kirine, ew tewra erkên dayik û bavîtiya xwe jî nekirine û ew yek li ser plansaziyeke pêşeroja zarokan xwe nîşan dide.

Li gorî dozên ji hêla malbatan ve û di paşerojê hatine ceribandin de, encamên di bin navên malbat û malbatan de tevnebûnê behremendiyê tîn xuyakirin dikarin wiha rêz bikin:

- Tirs, tecrîda ji civakê, vekîşîna ji xwe, bêstatabûn,
- Hêlbûn û kêmasiya berbiçav - şevên şevê dubare dikin, berê xwe didin paşerojê, nerazibûna reaksiyonê, tîrsa ez ê paşerojê disa û careke din tecrûbe bikim, pêvajoyên jiyane yên neyînî ne, ji rastiyê dîr dixê.

Bandorên van nîşaneyan li ser civakbûna zarok/ciwan di qonaxên paşîn de wiha ne:



Sekil III: Kaynak (Polat 2015)

Nexwesiya Zexta Piştî Trawmayê: Piştî biyereke travmatîk nexweşiyên ku derdikevin hole ye.

Dissosiyetîf: Piştî biyereke travmatîk di kesayetê de xerabûna nasname, karakter û hwd...

- Baweriya berbiçav, bêhempa di tîkiliyên wan de bi hawirdora xwe re,
- Pêkvebûn an sînoorkirina tîkiliyên bi hevalan re û her gumanbarî,
- Fişarên tirs û xofê ku bi domdarî û pir zû pêşve diçin,
- Malbatên wan jî bo wan giraniyek in û zarok neçar dimînin pêşve bibin,
- Bêdengiya di armancên plansazî û pêşerojê de, di nav de pişe û avakirina malbatê.

Qedexiyên civakî yên wan demên berê hatine ceribandin ev in:

- Bi xwe li çîna kêm û zindî dibînin, ji civakê din ve tîkîlî,
- Ew neçar in bi berdewamî li ser rewşa aborî bifikirin,
- Ne ku ji derûdora welêt wekî welatekî derbasdar his dike.

Di van rewşên neyînî de bandora li ser civaknasiya zarok / ciwanan wiha ne:

- Nakokiyên bi komên din re û zehmetiyên jiyane bi wan re,
- Activiteyên salakê di demên sînoorkirî yên civakî, çandî û civakî de,
- Ev wekî kêmasiya azadiya aborî û tevliheviya li civakê derdikeve holê. Mixabin, ji bo pêşî li xirabûnê piştî trawmayan ên ji hêla gelek gelên heman çarenûsê dijîn, nemaze kurdên li diasporayê hatine sirgûnkirin, dewletên ew penaber kirine ji bo dermankirina wan tu serlêdanên stratejîk

nekirine. Sedema herî berbiçav a trawmayên wan kesan ên pêşkeftin û derketina ji malbatê û sosret kirin, behreyên ne diyar ên dewletan, dibin sedem. Bi vê yekê trawma bi xwe re karesateke civakî ya mîna vîrusê tîne.

Bi awayekî bi lez divê pêşî li trawmaya navmalî bê girtin. Malbat bêyî dereng bimînin di bezgehên pêwendidar re tîkiliyê deynin û li alîkariyê bigerin û ji bo xwe û zarokên xwe jî her cure alîkariyên bijîşkî û yasayî agahdar bikin. Hewce ye ku ew bi wan re bixebitîn, nemaze di komele, sendîka û li hin deverên civînan de ku pispore bi zorê tîn civandin û tedbirên li dijî trawmayê bi cih binin.

Çavkanî:

- Polat, A. 2014: Trauma û civakbûnê. Bandora tecrûbeyên trawma penaberan li nîşên nû. Apa Iemîn. Wiesbaden, weşanger Springer,
- Rosenthal, G. 2002: Jiyana sê nîşê li Holokosta. Malbat û suçdarên Nazî yên Shoah ku sax man. Apa 3yan. Weşanxaneya Psychosoziale,
- İlhan Kızılhan I. 2018: Psychoeducation ji bo trawmayên trawmayê: manual ji bo xebata komê bi koçber û penaberan. Langerich, Papst,
- Fischer, Gabriele. & Riedesser, P. 1999/2004: Pirtûka pirtûka Psychotraumatologie. München: Reinhardt.
- Flatten G, et al. 2004: Rêbernameya tîkîna stresê ya piştî trawmatîk û nivîsara çavkaniya wê. 2ndapa Zyemîn. Stuttgart, Schattauer weşanê dike

Şert û merc û tarza jiyana malbatan	Tarza jiyana malbatan û xerabûna helwestan	Li ser civakbûyîna zarok û ciwanan bandora nexweşiyê
Bûyerên ku malbatan niha û di demên borî de jiyîne	<ul style="list-style-type: none"> • Tirs Ji civakê dûrketin, bêbiryarî û xwe paş ve kişandin • Halûsinasyon xerabûna baldariyê - Rewşa dubarebûna ditîna kabûsan, biranîna rabirduyê, xerabûna be - Tirsa her tim û dubare jiyîna rabirduyê - Pêvajoyên neyînî yên jiyane - ji rastiyê revîn 	<ul style="list-style-type: none"> • Bi derûdor re tîkîlîdanîne de ji xwe nebawerî, tenêti • Di tîkiliyên bi hevalên xwe re de qelsî an jî sînoorkirina van tîkiliyan • Bi awayekî domdar û bi lezûbez pêşketina tirs û qurfê • Her ku diçe malbatên wan ji bo wan dibin bar u bi vî ve girêdayî di zarokan de pêşketina hesta bêçaretîyê Ji bo armanc û dahatê pîlan çêkirinê de ji xwe bêbawerî
Rewşa ji civakê dûrxistin a ku berê jiyaye	<ul style="list-style-type: none"> • Xwe biçûk dîtin, bi civakê dîtir re tîkîlîdanîne de zehmetî kişandin • Rewşa her tim fikirîna şert û mercên aboriyê • Xwe aydê welatê ku lê dijî hisnekirin 	<ul style="list-style-type: none"> • Bi komên dîtir re jiyîna nakokîyan û bi wan re jiyîne de zehmetî kişandin • Di warê aboriyê de tunebûna azadiyê Bêahengiya di nav civakê de

Muzîkê kurdkî de qonaxêko newe: Adir Jan

Welatramîn Azad

Ziwanê deyîran Adir Janî her çiqas kurdkî bibo o muzîkê zaf ziwaniyê keno. Deyîrê albûmê ey girani bi kirdkî û kirdaskî yî, teyna deyîrêka tirkî esta. Tayê deyîrê albûmê di ziwaniyê: Deyîra Janakî Mou bi kirdkî û yunankî ya, deyîra Maçî kirdkî û kirdaskî ya. Tayê deyîran zî kirdkî û kirdaskî tîmîyan amêyî vatîş. Hetobînê ra zî Adir Jan deyîranê û konseranê xo de bi qismî ca dano sey ziwaniyê soranî, farskî yûnankî, al-mankî, îngîlîzkî, erebkî û farskî.

Ma şîyî deyîranê albûmê Leyla hîrî beşan de kategorîze bikerî. Deyîrê eşqî, deyîrê welatî û deyîrê sosyolojîk û ferdî. Maç, Janakî Mou, Aşq û Evîn, Tenco û Sêva Sorî deyîrê eşqî de yî, Medley-1 û Şengalî deyîrê welatî yî û Bawkê Mî, Ecel Elinden û Keskesor deyîrê sosyolojîk û ferdî yî.

Adir Jan muzîkê xo sey “Cosmopolitan Kurdesque” pênasê keno û muzîkê xo mîyanê world musicê de ca keno. Adir Janî ro-partajêke xo de muzîkê xo yo Cosmopolitan Kurdesque, no hawa îzah kerdîbî: “Muzîkê mi aîdê her cayê dinyayê yo la bingehê muzîkê mi de muzîkê kurdkî esto.”

Senî hawa muzîkê Adir Janî zaf ziwaniyê ra pê yeno eynî hawa harmonîya zaf terzanê û ensturmananê çîyawazan ra pê yeno. Na harmonîye zî muzîkê dewlemend kerdê û zewqê hunerîya ke bêhempa viraştê.

Teyna hetê tarzan û ensturmananî ra nîyî hetê vengî ra zî muzîkê Adir Janî dewlemend o. Vengê xo zaftewirîn bikaerdo. Tayê deyîran de vengê xo sey formê dengbêjî bikarêrdê, no hawa kerdîşê zî estetîka deyîrê zaf baş û rînd kerdê. Vengê ey û ê ensturmananî yewbînî tamam



Sifteyî albûmê Adir Janî bi nameyê Leyla, Newroza serra 2019ê de vejîya û tê de des deyîrê kirdkî, kirdaskî û teyna deyîrêka tirkî estî

kenî la zafê deyîran de vengî ensturmanan hîna domînant o. Muzîkê ey de formê govendî zaf ca gêno, zafanê cayanê deyîrê xo bi formê govendî vatî. Formê govendî modernîze kerdo û kerdo sey formê dansî.

Merkezê albûmê eşqî esta. Albûmê de tewr zaf temaya eşqê ser o deyîr virazîyayî. Kê vanî qey albûmê deyîranê eşqî yo. Deyîranê Adir Janî de eşqa heteroseksuelî ra zaf eşqa homoseksuelî esta. Eşqa yewhetîn û dûrî ra nîyî, têhetîn û tîkberzîn, têverarayî esta û no vateyî deyîra Maçî eşqa têhetîn nawnêno ma: “Eman dilo, eman dilo /De lez biyê mi maç bikiro/Zerre mi zî rehet beno”

Deyîra Aşq û Evîn, deyîrêka eşqa heteroseksuel û homoseksuel

a. Ser o rîndîya, weşîya... eşq a. Kê şîyênî bivajî ke motto albûmê Leyla wîna yo, “Wa bimiro çîyakewtîş wa biciwîyo eşqî”. Ez vano qey reya verîn a ke kurdkî de deyîrêka vateyî no hawa estî: “La, eke kênek kênek ra /Yo laj yo lajekî bîn ra /Has bikir se şîma’r çî yo” Çînayatanê ferdanê hemzayendan şermezar û rexne keno û qebulbîyayîşê înan ana ziwaniyê: “Şîma ma kîşt, laj û kêna.../Bes o! Ma qewul bikêrî”. Rewşa înan melankolîze û dramatîze nêkeno bikeyîf û biçoş û bihez îfade keno.

Tayê xûsusîyete resenîye muzîkê Rêncber Ezîzî muzîkê Adir Janî de estî. Nuştêyê mi yo ke bi nameyê Resenîya Muzîka Rêncber Ezîzî, Kovara Zîryabê de weşanîyabi, mi resenîya muzîkê ey mi wîna pênasê kerdîbî: “Resenîya muzîkê Rêncber Ezîzî de muzîkê xo îfadekerdîş û tasdiqkerdîş nîyo û viraştîşê hîssîyatîyê cuyahes û dînyahezî yo. Hîssîyato melankolîk û mergheşî nêvirazêno. Rêncber Ezîzî bi muzîkê xo hîssîyatê ke pozîtîf û cuyahes û dînyahez awan keno. Kê ke Rêncber Ezîzî goştari kenî kê bêhevî kê benî hêvîdar î. Kê bêkeyf bî kê benî keyfdar î. Kê xemgîn bî kê benî bextewarî. Kê rîbermî bî kê benî rîhiwîya ye.” Muzîkê Adir Janî de têsîra Rêncber Ezîzî xo zaf dîyar kena. Nîmune deyîra Maçî de boya deyîra Dilo Dilo ya Rêncber Ezîzî yena, xora Adar Janî bi no vateyanî: “Hewar dilo, ti qê çîrê mî’r yo /E-mailê ninusenî” selam erşawêno ey rê.

Muzîkê Adir Janî hem vîrê kolektîve ra dera nêbîyo û xo xitabê vîra ma yê kolektîv keno hem zî vîrê ma yo kolektîv û muzîkê ma yo tradîsyonî modernîze keno; newe ra afirnêno. Bitaybetî muzîkê hunermandanê kurdanê ciwanan de muzîkê înan hetê vîro kolektîve ra dera bîyo, xo nêşêno biresno no strukturî û xitabê ey bikero. Deyîra

Sêva Sor, deyîrêka eşqî ya bikeyîf û biçoş e. Ser o maçkerdîşê xortekî ya. Vateyê deyîrî xitabê vîrê ma yo kolektîv kenî la hetê îcrakerdîşê ra modernîze bîya. Peynî de vatox resêno miradê xo xortê maç keno. Xora zafanê deyîranê Adir Janî de peynî de bi serkewtîşê eşqî qedînî. Eşqî sekratê de newe ra gonî keno. Deyîrê Medley-1: Potporî ya. Qismanê deyîranê gelêrîyê kurdkî ra pê yena. No kilamî bi ensturmanê rojawa û rojhelatî bi sentezêka newe amêyî şîrovekerdîş û afirnayîş.

Vengê Adir Janî bi çoş, bi şên, bi keyf û bi hes û bi eşq o. Vateyan û îfadeyanê zaf melankolîk û dramatîkan bi vengê xo sey heswerî û keyfweşî newe ra afirnêno. Qalanê klîşeyanî newe ra mana dano înan î. Deyîra Janakî Mou, bi kirdkî û yunankî ya, waştî-a rê amêya nuştîş, biherket û biçoş a û ahengîya veng û vateyî esta. Vate û îfadeyî zaf klîşeyê melankolîk û dejîn fekê Adir Janî de melankolî û dejî ra şîwênî û keyf danî kê. Nîmune sey no qalanî, “Bê tu ez nişken/Hêwax, hêwax”, “Zerre mi tu’r vêşeno/ Ez tu ra vîno vîno/Cîger mi tu’r vêşeno/ Ez tu ra vîno vîno/Zerre mi’ d ca zî çînyo”

Hetê fonksîyonê ra muzîkê Adir Janî muzîka kurdkî de qonaxêka newe ya. Muzîka kurdkî ya Bakura çewrê serranê peyên hetê fonksîyonê ra melankolîze bîyo. Muzîka kurdkî de qe keyf, şa, bextewarî... nêmendê. Malmîsanîj şîrêkê xo de vano “ luliya ma senfonîya derd û kulan” kê şîyînî wîna vajî ke muzîkê ma bîyo senfonîya derdan, kulan, dejan, xeman... î.” Semedê ke albûmê Leylayî de no melankolî çîn o, xo no melankolî ra seveknayo nayê ez ey muzîka kurdkî de sey qonaxêka newe pênasê keno.

Hele ma biewnî Adir Janî albûmê xo yê dîyînê de na qonaxî çiqas bikamîlo û averî bibêro?!

Rexneyê ma û kerdenê ma!


U. Serhildan Andan

Vatîşêko zazayan esto, vanî, “Şar ma şînaseno.” No vatîş gelek gelek xori yo û qasê xorîbîyayîşê xo zî giran o. Raştê ci şar ma şînaseno? Gelo hayeyê şarî, ma ra çendêk esto? Ma eşkenî vajî ke şarê ma, ma fam keno? Wa fikranê ma hetêk de bimanî, wa heme kerdenê ma zî hetêk de bê; gelo raştê ci şar ziwaniyê ma fam keno? Nê persî sereyê ma wenî/hurînenî! Çîra ma tu kes derheqê nê persan de nêfîkirîyênî? Çîra qet nêno ma vîrî ke ma vajî; gelo endêk xebate esta, şarê ma pê zano yan nê? Nê persî û nê vatîşî seba ziwaniyê. Eke ma behsê ziwaniyê kenî gere ma vernî de bifikirî ke kam çiqas û senî ziwaniyê ma fam keno. Gere ma heme çîyan ra ver bîyarî xo vîrî ke meseleya yewine; famkerdîş o. Ma bi serran bixebitî û derheqê hezaran çîyan de bibê wayîrê zanayîşan; eke ma nêşêkî nê çîyan bi ziwaniyê şarê xo biresnî şarê xo çî manaya kar û gureyê ma manena.

Ziwanê ma her ke şîno apey maneno, helbet derheqê ziwaniyê de keylî xebatî estî û berhemê erjîyayeyî resenî wendoxan. Helbet bi ziwaniyê ma xebatî virazîyenî, nuştêyî nusîyenî labelê meseleya nuştîşî bena barêko giran. Meseleya ziwaniyê heremî hetêk de meseleya standartî hetêko bîn de mezgê merdiman temîyan kenî. Rojname, televîzyon, medyaya komelkî, weşangerî û gelek qadanê bînan de kesê ke wazenî bi ziwaniyê xo bigurîyê zaf zehmetîyan ancenî. Keylî sebebê nê zehmetîyan estî labelê sebebê tewir pîl ziwaniyê ma yo. Heme merheleyê standartbîyayîşê ziwaniyê tamam nêbîyê û hêna naye ser pîyasaya ziwaniyê hêra nêbîya. Nê wîrdî sebebî mojenî ma ke rayîrê ma hema zaf derg û zaf televîyîn o. No rayîro zehmet do bi hetkariya hêmper biqedîyo.

Gelek kesê ke zazakî/kirmanckî ser o xebityenî wayîrê rexneyan ê. Helbet rexneyê ke yenî kerdene bi raştî û hêvîyan yenî xemilnayene. Her rexneyê ke seba kar û xebatê ziwaniyê yenî kerdene, seba kesê ke qada zazakî/kirmanckî de xebityenî zaf muhîm û erjîyaye yî. Bi nê rexneyan asîyeno ke kar û xebatî yenî teqîpkerdene û seba heminan rexneyî estî. Naye kêfweşîyêk awan kena. Labelê na kêfweşî heta cayêk dewam kena û cayêk ra dima tadîyena acizî. Rexne estî la kerdenî çîn ê, rexne estî la mudaxele çîn o. Ge ge zî rexne estî ke tena nameyê înan rexne yê. Derdê kesê ke zazakî/kirmanckî ser o xebityenî no yo ke; wa baldariya ziwaniyê zêde bo û heme kesî bieşkî biresî sewîyeya wendîş û nuştîşê zazakî/kirmanckî.

Meseleya esasî famkerdîşê şarî yo, eke şarê ma, ma fam nêkero çî derdê ma esto ke ma bi ziwaniyê xo binusnî. Helbet meseleya raştînuştîş û standartî muhîm a la naye wa nêkewa vernîya famkerdîşê şarî û nêba sebebê şîkiyayîşê hewesê merdimanê ke wazenî zazakî/kirmanckî binusnî. Wa her kes bieşko goreyê heremî xo nuştêyan binusno, wa her kes nuştêyanê xo bîrşawo rojname, kovar, tv û rîpelan labelê qeîdeyê nuştîşî zî wa nêerziyo hetêk. Derdê ma averberdîşê ziwaniyê ma yo; hetê nê derdî de derdêko bîn zî famkerdîşê şarî yo. Heta ke ma vatîşanê xo nêdî famkerdene, nêbeno ke ma behsê ziwaniyê kulturê xo bikerî. Heta ke ma barêk nêgîrî paştê xo ma nêşêkenî rexneyan bikerî. Wa rexne û kerdenê ma yewbînan tamam bikerî.



Ronahiya Rojê



Berfin Dijle

Heta ku?

Du meh û niv e, ji sê çar caran pê ve, ew jî bi banga mela re, min piyê xwe navêtiye derva. Naçim mala tu meriveki xwe. Çend caran kesên jî bo hatina malê li min geriyabin jî, min rê neda wan. Lê çiqas cara ku min di şibakê de jî li derdorê nihêrtiye, ti tiştêk jî rojên xwe yên berê ne şihitiye.

Disa trafika insan û erebeyan weki xwe didome. Heta şivanê hergav; keriyê pez dide pêşiya xwe û li ser mêrga parq û bûlvaran diçêrine.

Bi rastî heta niha, ez li kê geriyame û min jî wan pirsîye, kesê negotiye: "Ya jî malê yan jî li derdora me kes bi vê şewbê ketiye." Tenê du hevalên min gotin: "Meriveki me, bi vê şewbê ket û ew jî bi karantîna malê tedawî bûye."

Ev, kevir û kuçik hema bi serê min de bariyane ku min derketina derva li xwe herimandiye. Heke awa bidome, ez ê ne ji ber vê şewba Covid-19'ê, ji ber çar diwarên malê nexweş bikevim. Min têkilaya xwe û dergevan jî, ji binî ve biriye. Hevîr dikim, nan çêdikim. Şîr dimeyînim dikim mast. Kî dizane, heke awa bidome, heye ku herim sergînan jî.

Vê sibê min hew xwe ragirt, rabûm ku derkevim derva. Min hê berî pandemî bê qebûlîkirin, hizra xwe ya maskeyan kiribû. Heta min ew dîtî û yek ji wan da ber devê xwe, spîka çavên min zer bû. Min lepikên hijyenîk kişandin destê xwe. Fanûriyê xwe li xwe kir, ji bo vîrus neyê xwe li milên min daneyne.

Min xwe da ber eynê, ka kêmasiyek girêdana min heye an na. Piştî qîma min bi girêdana min hat, min hêdîka destê xwe avêt derî, serê xwe derxist derva, ka kes nêzî derî heye an tune ye û ez hê derketim derva.

De nebêjin derva, her der bûye perçeyek bihuştê û maye. Bihar e. Dar û ber tev xemilîne. Bêhna misk û enberê jî çiziyên bayê diwerive. Tenê min meşa xwe jî bîr kiriye. Tê sond bixweyî bêji qey ne rîya dûz e, pêplûk e û ez tê de dikîşim jor.

Ditirsim leqayî kesekê bibim jî wekî çav bi gurê Manco bikevim, rêya xwe diguhirînim.

Şarkuteriyek derket ser rêya min. Nobedar got: "Abla, saet di nehan de vedibe." Min qasekê xwe da ser kursî û min li derdorê temaşe kir.

Erebeyên di vir de diçin heta ber dev dagirtî ne. Şagirtên firinê û karkerên paqijiyê li ser karê xwe ne. Kuçik cotecot digerin û carna dikin hewtinî. Tenê qiyamet li min rabûye. Dilê min bi min şewitî. Çi tîrsonêk im. Wekî bi vê şewbê kevîm ew ê dinya xali bibe.

Min çend tişt kirin û ji wir çûm marketê. Li ser piyan bi qasîyerê re jî axivim. Wê jî got: "Min nebihîstîye kes bi vê şewbê ketiye."

Ê ê ê. Kes bi vê şewbê neketiye, ji market û beqalan pê ve hemû esnaf dikanên xwe çima girtine?

Xelq çima jî îş û karên xwe bûne? Du qurîşên qul nakeve malên wan. Kîloya penêrê meriv dibê qey çortan e, bûye sî û pênc banknot. Kîloya firingî û balicanan, ji pênc şeş banknotî nayê xwarê.

Meriv dibêje qey; ji bo vê bihayiyê bê hisûpis, bi dinyayê bidin qebûlîkirin, ev pandemî derketiye...

Piştî hatim malê, min poşet danîn balkonê û bi lezûbez min ser û guhê xwe da hev. Cil avêtin makinê. Milên derî û prîzan dezanfekte kirin...

Min biryar da ez ê edî derkevim derva. Ya na ew ê bi vê izolekirinê, derûniya min xera bibe û panikatak li min çêbibe. Ez rabûm çûm mala xûça xwe. Min neviyê wê da ser lingê xwe û tîra dilê xwe ew hejand û got:

Rovî rovî roviyê rindik
Serê qemça rovî bi kincik
Rovî çûye mala xalan
Danîn berê nanê ji arê malan
Serê qemça rovî jêkin
Di cêbika paşê kin.



Hele ka ez lê binêrim tu gedê kê yî...
Haha lawo tu ne ew vîrusa televizyonê yî




Erê xalo..! Netirse îro qedexeya derketinêye ji ber wê ez ê dest nedim te..



Xaloo! Cejna te pîroz be, ka ez destê te maçikim.

Saxbî... Xwedê emrê te dirêjke.

Piştê cejnê xwe amadake xalo ez ê dîsa werim.



Min dilê te xwend


Carekê Behlûl di meha remezanê de nêzî fitarê, selikek di destê wî de û ber bi kaniya gund ve diçû. Mêrikek rastî wî hat û jê re got: Oxirbe seyda bi ku ve diçî?

Behlûl got ez diçim ber kaniya gund ez ê fitara xwe li wir vekim, kerem bike tu jî bi min re were. Bi hev re çûn ser kaniyê û dema mele banga fitarê da, herduyan fitara xwe bi çend lib zeytûn vekirin. Paşê Behlûl destê xwe avêt

selika xwe û du heb hêkên kelandî jê derxistin û danîn ber mêvanê xwe. Paşê goştê mirîşkê danî ber xwe û dest bi xwarinê kir. Mêrik aciz bû û jê re got: Seyda ev çi mêvanperwerî ye, heke ez bûma min ê goşt bida mêvan û hêk bixwara. Behlûl got: Temam min jî eynî wiha kir, min wekî dilê te kir, ji ber te jî got; heke tu bûyayî te yê goşt bida min û hêk bixwara. Min jî eynî wekî daxwaza dilê te kir.



XAÇEPIRS



JÎ ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- 3.Cinavkek 5.Berevajiyê mirî.7.Koma pez 8.Hewa 9.Îrade 13.Kesê ji dê an jî bavê mirov. 14.Pergaleke desthilatiya zordest a berê. 16.Zinarên meht; teht 19.Ava bi berkeket a ji ezman dibare. 20.Noteke muzîkê 21.Xemil û xêza jin ji bo çavan bikar tînin. 22.Bêaqil, bê hiş 25.Noteke muzîkê 26.Bajarekî Rojavayê Kurdistanê 28.Sewalên malê yên wekî ga û gamêşan

JÎ JOR BER BI JÊR

- 1.Bajarekî Rojhilatê Kurdistanê
- 2.Qeza û tiştên nebaş ên ku tînan serê mirovan
- 3.Noteke muzîkê
- 4.Cihên bêhnvedana karwanan
- 6.Xwarineke sereke ya kurdan, girar 10.Dost, hevalbend, hezkirî
- 11.Dengê axîna ji xemgînî û êşê.
- 12.Dem, çax 15.Rewşa bê şer û pevçûn, lihevkerin
- 17.Kewên mê, mêkew
- 18.Hesret, daxwaz, xwestek, xwezî
- 20.Gel û zimanên afro-asyayî.
- 23.Ronahî, şewq
- 24.Tiştên nenas ên li ezman difîrin. 27.Bersiva neyînî

Bersiva hefteya borî



Strana helbestê: Yûnûs Dîşkaya

Mefer Kurdil

Hin kes hene, ne hewce ye mirov pesnê wan bide, ji ber ku hunera wan, wan dipesînê. Lê ji qewlê Ehmedê Xanî, ji Kurdî re:

"Çi bikim ku qewî kesad e bazar"

Dixwazim çend tiştan li ser dengê Yûnûs û muzîka wî bibêjim.

Gava yê cara ewil li dengê wî guhdarî dikin dibêjin "na, min deng û muzîkek wiha nebihîstibû". A rast guhdarên guhên wan hînî tiştên dizanin bûne, muzîka nû ne li gorî dilê wan e. Lê yê dixwazî muzîkeke bi giyanê kurdî û modern guhdarî bikin, "Yûnûs Dîşkaya" esmanekî nû dide ber baskên dixwazî ji xwe re bi kurdî bifirin. Wexta mirov bêje firin û navê Yûnûsî derbas bibe divê mirov qala "Teyrê" Fêrikê Ūsivî bike.

"Teyro, gelo qedrê fira xwe dizanî, Tu ku wisa difirî li wî esmanî?"

Dî helbesta Fêrikî de teyrek li esmanê Kurdistanê bi hesret difire. Bi deng û muzîka Yûnûsî mirov li xwe hayî nabe ku carekê bi teyr re difire. Ji ser Elegezê ber bi Agirî, Xelat û Sipanê ve...

Bi min strana "Teyr"ê di nav muzîka Yûnûsî de perçeyê herî baş û serkeftî ye. Di dawîya stranê de Yûnûs û Fêrik û Teyr bi awayekî ecêb difirin.

Wexta cara ewil min li vî stranê guhdarî kir, min ji Yûnûsî re got, di dawîya stranê de guhertineke ecêb heye, wî jî got, "ew ne ji min e ji helbestê ye." Vê dawiyê min baş fahm kir ku bersiveke di cih de bû.

Min xwest ez hinekî qala Yûnûsî bikim lê dinêrim ez li ser straneke mame. A rast divê ew lihevhatîne Yûnûs û Fêrikî bi çend gotinan xelas nebin.

Di muzîka Yûnûsî de lihevhati-



Di muzîka Yûnûsî de lihevhatineke bi aheng heye. Ew dikeve nav wan helbestan dixwîne, ev tiştêkî pir girîng e. Divê hunermend bi xwendîna helbestê ji ser hişê ve xwe biçê

neke bi aheng heye. Ew dikeve nav wan helbestan dixwîne, ji bo hunerê ev tiştêkî pir girîng e. Divê hunermend bi xwendîna helbestê ji ser hişê xwe biçê. Ne tenê rûhê Fêrikê Ūsivî, ê Kamiran Elî Bedirxan, ê Cegerxwî û Arjen Arîyî jî difîne ber mirovî. Ji hezkiriyên kurdî re bi dengê helbestî dilorîne. Her tişt bi keda wî ye, di stranên wî de bi piranî muzîk pir dirêj in. Di muzîka serê stranan de ez dikarim bi rihetî bibêjim, Yûnûs bi wan muzîkan re tê; beriya dengê wî dengê dilê wî tê bihîstin.

Yek ji stranên wî yê serketî jî "Heyv û Stêr" a helbesta Kamiran Elî Bedirxanî ye. Di vî stranê de bi dengê wî bêwelatî diniquete dilê mirovî.

"Dilketî me û sîngar im
Bê welat û bê bajar im"
Kamiran Elî Bedirxan mîrekî

zimanê kurdî bû, mîna birayê xwe Celadet; mîrekî bêwelat, bêbajar û bêgor û goristan di vî helbestê de xwe rê dide. Yûnûs dîsa esmanan vedike ji guhdaran re.

Di straneke din de wexta hesreta newrozê bi gotinên "Arjen Arî"yî bi "du hezar sal e"yê re distrê, newroz û xemgînî pir li hev tên. Ev xemgînî mîna helbesta Evdila Peşewî bi dengê Meryem Îbrahîmpûr digot "em sal newroz nakem" tîne bîra min. Xemgînî li newrozên nayê, lê li van her du stranên pir tê.

"Çil sal çû, ka miradê me...
Newroza min, yara kubar?"

Divê ez gelek stranên wî bi bîr binim lê derdê min ne ew e ku yek bi yek pesnên stranên wî bidim min di serî de jî ev got. Derdê min muzîka kurdî ye, muzîka bêgiyan, pêşveçûnek populer bi xwe re di-

meşîne; strana hunermend hîn ji gotinên wê fahm nekiribe ew ê bîkaribe çî bide guhdaran; strana ku ruhê stranbêj neşandibe û ew nexistibe atmosfereke nû, muzîka dûrî esmanê welatê xwe be, çî modern dibe, çî klasîk dibe, çî bi milyon hatîbe guhdarîkirin, pêşveçûneke vala ye lê ew ê hey li xwe vegere.

Divê yek ji derdên stranbêjan ev be; têkevin nav wan helbestan û bibin kesên ji çîroka wê stranê. Yûnûs bi salan e vî karî dike, bi dehan albûm çêkirine, derdê wî muzîk e, huner e. Bi kurdî bi rastxwendineke baş heqê helbestan dide. Ger em pesnê wî nedin û lê guhdarî nekin jî wê muzîka Yûnûsî hebe; ji ber xwedî giyanekî ye. Ji ber haya wî jê heye bê ka çî dixwîne. Yûnûs helbestbêjek e. Bi deng û muzîka xwe stranên helbestan diafirîne.



Pirtûka kilamên Radyoya Êrîvanê hat çapkirin

Ji aliyê Enstîtuya Çanda Kurd-Alman (Deutsch Kurdisches Kultur Institut) û Kurdisches Musik Und Kulturerbe E.W. (KMK) pirtûka bi navê "Stranên Arşîva Radyoya Êrîvanê" ku ji 4 cildan pêk tê derçû.

Berhevkariya pirtûkê Cewad Merwanî kiriye û di pirtûkê de bi giştî gotin û notayên 915 stranên cih digirin. Notayên stranên dengbêjan hatine nivîsandin û her wiha di warê akademîk de analîzên hemû stranên hatine kirin.

Mehmet Çakmak editoriya pirtûkê kiriye û muzikolog Veysi Varli jî kontrol, sererastkirin û têkildarî stranên analîz nivîsandiyê. Servet Deniz redaksiyon û Şiyar Ayaz jî notasyona pirtûkê kiriye.

Xebata 8 salan

Muzikolog Veysi Varli têkildarî vî berhema girîng agahî da û diyar kir ku Cewad Merwanî 8 sal berê ev xebat ji wî re şandiyê û piştê bi tevî lîjneyêke hatiye awakirin dest bi xebatan kirine. Varli da zanîn ku amadekirina pirtûkê di 8 salan de qediyaye û pirtûk li Ewropayê hatiye çapkirin. Pirtûk li nêzî 100 saziyên civakî û saziyên çapemeniyê yê li Amedê hatiye belavkirin. **AMED**



Kampanyaya skecan

Ji ber şewba koronayê (Covid-19) li Wanê koma Teatra Mencil neçar mabû dika xwe bigire lê wê xebatên xwe nesekinandin. Komê niha kampanyaya nivîsandina skecan da destpêkirin.

Kom dibêje, "Hûn binivîsin, em li ser dikê bikin şano" û bang li her kesî dike da ku beşdarî kampanyayê bibin. Teatra Mencil, piranî bi kurdî şanoyê dike û endama komê Dilvîn Abî wiha got: "Me jî dest bi nivîsandinê kir. Ji vir jî dixwazim bang li nivîskar, xwîner û her kesî bikim; skecan binivîsin. Dikarin bi rêya medyaya civakî yan jî e-mailê bigihînin me." **WAN**

Herê, ew der e.
Divê ku rojekê ez herim serdana wira.

Herê dinyayê, ku "felekê berê me nedana Newala Kelekê"*.


Ka çî bikim.

Va jiyana wisa ye...

Ew warê ku min û te lê şadbûn û şekirê qulqulki dîthemijand, ew bi-huşta zarokî û ciwanî ku her û her wê kulîr(l)ka soringî lê vedikir çiqasî bi me xweş bû. Hê jî dildar, evîndar û bendewarê wir im.

Ev çend carin di bîna wê bereşê re dibihurim, dîsa kulîlka min/me lê bi soringiya xwe dibiriqîne. Piştî van salên malkambax, bi piştî xûz î, çok qerimîn, ez ê çawa xwe bighînimê. Lê ehda min heye ku rojekê ev çêşên cerdewanan ne li wira bin, di demnîsanekê de ku kulîlk û şinahiyan wira nexiştandibe, di ser wî çemê evîndar î ber li felekê mîna demxweşên nigarkêşan re, ez ê wê jivangeha pîroz ziyaret bikim.

Em navê wê jî rasterast xweş hînebûn, tiştêkî balkêş û awarte ye. Zede nayê dîtî li herêma me. Pir hindik heye û li warên awarte ku axa wê nermîn e, şin tê. Ji ciyê bager î, hênik ku ajal xwe negihînen hezdikeyê û bi nazdarî xwe li ba dike û her şaxek wê çend kulîrkên xweşaheng dihewîne. Ku roj derbasbîbin, hema ku dest bigihêje, pelên xwe diweşîne, nazdar û xediyoq e, xeyda ye. Sorîya renga wê ber bi pirteqalî ye. Carekê min bihîst ku navê beybûn e. Min bi navê bey-



Ji Delav

Feratê Dengizî

Kulîlka Sor

bûnê helbestek jî li ser nivîsî. Lê paşê ez hîn bûm ku navê wê ne beybûn e, beybûn kulîlkek din e, ya ku em jê re dibêjin beybûn "Kulîrkehwan" e û gelek bêhnxeş e û bêhna qehweyê jî kulîlkên wê tî û di biharan de mirov bi bêhna xwe serxweş dike.

Axx.. dilo.

Hê jî em navê wê kulîr(l)ka xweşik nizanin. Wek nezanîna jiyana, evin û hezkirîne. Wek nezanîna xwedibûna li xaka pîroz. Wek dildariya qatîlên xwe... Wek dexsiya tûpişkiya hev.

Helbesta xwe diyarî wan rojên ku de qet neyên dikim.

BEYBÛN

-Ma bila ev xemgînî bidome!

Heskirîna te dijîrand

Dilê min / Lê mixabin

Min navê te nizanbû

Wek evîna "Platonî"

Pê re gotin navê te BEYBÛN

Tu kêrî / Zor peyda dîbî li Xwezayê

Narînî / Nazîkî / Kêncanî

Pelên te zû diweşin

Ji hember êrîşiyê

Carîna jî ji sira bayê beskirîne

Narîna evîne-Mîna dilê min, ji ber

evîndarê-

Evîna ku nayê gotin...

Sorzeriya te pir xweş e

Qama te ne bilind

Derketinek gurr ji erdê

Bi dehan şax ji rebeke

Axa te bi dilê te

Li qiraxa rê

Silavdarê rêniyan ji dexsiya evîne

Divê li te bibeskirin bê nêrîn...

Bêhna te ji her dil fehm nake

Ji Memê Alan vir de

Qîmetê ta nayê zanîn

Pelên te palas in li erdê

Bi sira bayê sibê

Ez ji bîr nakim xweşikê û beskirin

Û jînevîna te

Tew ji li welatê min...

Ez zanim dilê te şevitî

Hêşir di çavên te nema ji girî

Werrê melûl li rîya min..!

15 Rezber 1999 / Ordî

De vaye derd ev e, derman jî nizanim, wele nizanim.

Jiyana guherî, heta bi xweza jî pê re. Ma kê digot ew ê Gola Elo jî, ew gola ku bêqam bû, ziwa bibe. Vaye di çend mehên havînî de ew avê jî me dixwaze. Melûlo dilo yan jî jiyana bêbext a dilkevir û bextperayan!

Vê sibehê bilbilê warkevir nedisekinî. Axîn û lorîna wî ez ber bi warê me, binberêşê ve kişandim. Ez ê herim

pîrozgehê, kulîlka xwe ya soring bibinim û derd û kulan, xêrdîtiya jiyana parve bikim. Bele... xunav ketiye, erd şil û xweşî dibare jî bihara xemgîn a emrê min. Cerdewan jî hê nehatine, ew kula ji ya Kerkûk û Şingalê bi elemtîr, de haho bila birînen dilê min disa der nebin û elem neherike.

Em li ku mabûn. Min bere xwe da kaş, hêdî hêdî hênika hiya sibeha biharê dikîşnim dil hunavê xwe, bi sermayek sivik diricifim. Lê germahiya dîtina kulîlka sor min serxweş dike, serma li dile min kar nake. Li qorziya tehtê zivirîm, va ew nehitê gir, ev himê stergeha me ku kulîlka me jî di rizdeya di ser de ye. Herê, nêzikahiye lê dikim, şewqa zêrîn a şewqê jî wê dibiriqîne.

Çend gavên din bi ser kaş ketim, devê bereşê ma çend gav.

Ev çî ye?

Bin bereşê tev têlên mirêsayî mîna derdora girtgehê û bêhna zibil, zibilê pez dilê min xeland.

Min guh neda rewşê û berê xwe da kulîlka sor, kulîlka evîne.

Çî bibinim?

Ew sorahiya... Ew sorahiya, sorahiya pêlîstokeke qetiyayî ya bûka baranê.

Wey li min...

16-30 / Kewçêr / 2017-Delavê Dengiza

*: Bivêjek herême, herêmi ya herêma me; yanî "em bêqare, bêqareyê/a kar, zor û zehmetê. Rihetî ji me re nîne!"

Min Ev Helbest Çawa Nivîsî?

Mertal

Selmî Temo



Hespekî kumêt tê bîra min, li Gundê mala xalan. Şerbetko. Li hespi siwar bûme, diçim ber bi Ziyareta Omê ve. Li wir mêrgeka heşîn û avî heye. Li raserî mêrgê kaviîlê gundekî kevn ê bavkalan, Girê Romiya. Li hemberêkaviîlî, “zilîstan” ek heye di quntera palê da. Liqa Seyîdxanê Kerr û malbatênwan li wê zilîstanê sitirîbûn. Bavkalan ew xwedî kirin û parastin. Birin ji Elmedîna/Batmanê derbas kirin da biçîne “Xeta Frensawî.” Lê milîs û gubhelên dewletê bavkalan îxbar kirin. Leşkerên Roma Reş, Gundî xera kirin. 28 mêr ji Kurd û Ermenan desteser kirin û birin ber bi Qubînê vebo darîzînê. Lê di rê da, li binê Çiyayê Qêre, li Kevirê Reş, ku piştî komkujîyê navê “Newala Miriyan” lê kirin, gulebaran û şehîd kirin.

Yek ji kevintirîn bîranîna min bi hespekî ra ye. Tê bîra min, gava xalê min ê Evdilbaqî ez siwar kirim, tirsek hebû di dilî da. Lê xwarzîti ew tişt e ku tîrsa xwe veşêrî da xal te hemêz bike û bipesîninê. Ew xalê ez li hespi siwar kirim, ber bi nivêşeva vê duşemê ve koça dawîn kir. Bijiyan wî hespê kumêt di xewna min da li ser serê xalê min ê ji kansêrê zelût bûyî li ba bûn.

Hespên dastanan dihatin xewna min gava zarok bûm, gava delalê xalê xwe bûm. Her cara ku dengbêjêkîrêwî xwe dispart mala me û dest bi Memê Alan dikir, Bozê Rewan li asîmanê min digeriya. Bapirên ji alî dê û bavê, li hespên xwe yê sorboz û qemer siwar, digeriyan. Hesp li her der û deverê bûn. Li ser dîwaran, Hezretî Elî li ser piştî Dindulê, zulfîqar di dest da ber bi Kela Heyberê ve wek brîskê diçû. Siwarî ji serayê keç direvandîn. Hespên çavxêzal li daristaneka dîr diçerîyan. Ha ku te dît, li derve, yek ji dîr ve dixuya, dengê beza wî li paşiyê, dihat û mizgîniya xêrê yan ji xebera reş dîanî. Gava dibû behsa hespekê/î, rengdêrên xeyalî li pêşî siwar dikirin. Qey wî çaxî Kurda/ê ne helbestkar peyda dibû? Ez dinav koma helbestkaran da mezin dibûm.

Dû ra dengê simên hespan wenda bûn, morana li pey nalên wan danî. Êdî tenê di filmên li ser televizyonan da xuya kirin. Kurdî û helbest ji odayên mewanbar kirin, ziman û stranvanên barbaran ketin malan. Êdî xwediyê gotin, weaz, salixdan, sirûd û awazê ew bûn. Lê hesp xwe nadine dest. Her li

kû bin, xwediyê xeml û şexsiyeta xwe ne. Pîvera me ya nû ji hesp bû ku meta mina Sekîna xweştirîn pîvera filmeka baş wiha danî: “Filîma hesp tê de hene xweş e!” Bila li ser vê pîverê ti kes gotineka kin û dirêj nebêje!

Min da pey şopa hespan. Bala min kişand ku Helmuth von Moltkeyê (1800-1891) leşkerê pe-reyî, piştî tevli nijdeya Osmaniyan dibe û dibe qesasek ji qesase komkujîya li Bakur, behsa hespên Kurdan dike; bêje 180 sal berê. Min agahiyên wî dayî, bo romana xwe ya bi navê “Gava Genim Seridîn” dan aliyekê. Êdî piştî demekê bû meraqa min. Fotografên serok û lehengên siwarî yê Kurdan bala min kişandin. Wek mînak Mele Mistefa Barzanî hespa xwe huzmeş diajo, Fermandar Cemal çargavî. Dîkarî bêjî qerekerê siwarî û hespê dibe yek. Hemû Kurdên berê siwar bûn. Simko siwar e, Şêx Mehmed, Elî Şêr, Şêx Seîd û Seyîdxanê Kerr ê “xema Kurmanciyê jê radibe” siwar in.

Çîroka jiyana min çîroka hespekî ye! Neh deh sal berê li Engilîztanê bûm. Ez û Muslum Yucel li heman bajarî bûm. Li vir nikarim zêdetir bêjim, ji ber ku taybet e, lê Muslum li ser hespan hûr bûbû. Gellek bala min kişand, jê hîni gellek tiştan bûm. Xanimêka navsere ya Engilîz ji hebû li wir, navê xwe kiribû Şîna Kurdî û teza xwe ya masterê li ser hespên Kurdan amade dikir. Jê ji hîni gellek tiştan bûm. Mixabin min metnê Muslum û teza Şînayê nedîtî, lê meraq ew tişt e ku bêyî dîtî ji dibînî!

Em neteweyeka jîndar in, ji tovê dar û berê welatê xwe heşîn bûne. Gava nav û hinava Kurdekê/î vekî, olana hîrîniya hespên esmanî jê tê. Ew ruh e li çarnedorê welêt dilîlîne. Her guh didim wî dengî, wa nêzik dibe, dîr dibe, xuya dike, kîr dibe, deştekê li ber dilê çiyakî şêrîni dîke. Guh didim ruhê zimên. Çi ye? Çi reng e? Va ye dixuye: Şehîd an kuştî venagere, lê hespa wî vedigere. Ew hesp, ruhê miriyî ye. Lewma cazûya metnê nahêle “Mihemedê Elî, bavê Zahîdo, siwarê Tiknal” bê veşartin. Dixwazî bila gule sar bibe birîne da hay lê, de haylê haylê.

Êdî ruhê helbestê temam e, lê ka mijar? Mijar li Kobanî ye. Gundek heye bi navê Serzorê. Li rojhilatê Kobanî. Heft şêr li wir asê mane. Pênc şêr diçin hawara wan. Pênc jin, heft mêr in. Dîdo ji wan birîndar in. DAIŞ tê bi ser wan ve. Ji her sengerê gazî dikin ku werin hawarê. Lê dozde şêr nahêlin. Dizanin kê were, xelasiya xwe tune. Deşt e, bê star e. Dizanin xelasiya wan jî tune. Cîhazê vekirî diheşîn. Weke rojeka adarê li ber Ava Spî ji xwe ra suhetê germ bikin, diaxivîn. Behsa jiyana rojane, îro û berê dikin, wek hîrîniya hespên xewnan dikenin di şer da. Hin ji wan xwerexneya xwe didin ka çi kêmasiyên xwe hebûne. Ma ew wext e? Erê, ew wext e. Em livir behsa dastanekê dikin...

“Hilbe Kobanî” dinivîsim. Pirtûk ne epik e, lê ya li Kobanî bûyî dastaneka dengîne. Dastana pêşîn a Kurdan e ku bi serkeftîne bidawî dibe. Lê bêyî hespan tu ez ê çawa vebêjim? Ew ciwanên li nav kavilan heşîn bûn, qey ji goşt û hestî bûn? Heke hespên esmanî neçûna hawarê, pêkan bu ku bi ser kevîni? Ne bawer im, qet ne bawer im, helbestvan im, min rastî navê, rastî li min nayê.

Dibînim, her lehengekî hespek xwe heye. Her hespekê/î navek xwe heye. Ka yek bi yek bêjim. Bavê Edo: **Gurûz**, Bavê Huznî: **Beşo**, Bavê Lalo: **Kovê**, Bavê Qereman: **Têcir**, Brahîm Xelîlê Xeco: **Cegero**, Cembeliyê Hekarî: **Xemrevîn**, Cemîlê Çeto: **Çalo**, Cangîr Axa: **Hirço**, Derwêşê Evdî: **Hedwan**, Elîcan (Bavê Miheme Reşîd): **Kûvî**, Elîkê Batê: **HespêBoz**, Eliyê Üsiv: **Derwêş**, Emer Begê apê Memê Alan: **Şemlê**, Emîne Ehmed (Bavê Şîkrî): **Sîqa/Sîqal**, Evdilqadirê Zeynelê Evdî: **Gilor**, Feqî Eliyê Pîrê: **Belo**, Ferzende Beg: **Eznewir**, Feslî Beg: **Hemdanî**, Hemîd Beg: **Gulfî**, Hesê Karazî: **Şeşper**, Kerr: **Sosik**, Keyxusrew: **Şevdiz**, Korogî/Kurdoxlî: **Qirat**, Kulik: **Nijdî**, Memê Alan: **BozêRewan**, Mi-



hemedê Elî: **Tîknal**, Reşîd Axa: **Dilo**, Rostemê Zal: **RexşêBelek**, Rizaliyê Xêlîd: **Gêjo**, Sebrîyê Mihemedê Mistê (Bavê Fexriya): **Gêjo**, Seîdê Nado (Bavê Dilşayê): **Gêjo**, Selaheddîn Eyûbî: **Elfesya** (çi seyr e ku navê keça Ferzende Beg ji Elfesya ye), Seyîdxanê Kerr: **Gêjo**, Simo Xatê: **Xerîb**, Siyabend: **Daybelqiran**, Şêx Fexrî: **Felek/Felekbez**, Şêx Seîd: **Derwêş**, Üsiv Beg (Bavê Seyîd Betal): **Ereb**, Üsivê Xido: **Kovî**, Xalid Begê Cibrî: **Yekta** û Yadin Paşa (Eyloyê Kurdistanê): **Nîgar**.

Piştî vana tewr, meş û beza hespan divê. Kihêl, hedwan, sinjabî, kumêt, şînboz, şê, rewanê kaw, huzmeş, çargavî, reşboz, sorboz, zer-kumêt, qule, qemer, bedewî üyd. Helbet 12 hevalên li Serzorê xwedî nav bûn. Daybav an jî ap û xalan nav li wan danîbûn. Lê paşî navên xwe guhertîbûn, bo xwe kode-nav diyar kirîbûn. Du rastî li hev qelîbandîbûn. Dengê reqqîna du rastiyan bû. Wek Edward W. Said gotiye, “mirov dikare ax û welatê xwe di xiyala xwe da ji dijmin bistîne.” Ji bo vê, destpêkek nû divê û destpêka despêkêka nû, guhertîna navî ye. Min ê ji bi vê helbestê welatê xwe ji wan standiba. Lê rastiya sêyem diviya, min nav û dirûvên nû û sêyem li wan kirin, min ew kirin hespên esmanî.

Xwendinên li paş ji hene, helbet bi *Poetikaya Aristotelesî dest pê dîke heya Semiotics of Poetrya* Michael Riffaterre tê. Heke ji aliyê dîrokî ve binêrî, divê bibînî ku ruhê Agirî li Kobanî vejîyaye. Naxwe xwendinên kîr li ser Agirî û sirûda “Hilbe Agirî” li dorê. Helbesteka Kawa Nemir heyelî ser hespan, “Qiseta Hespên Esmanî”, di pirtûka Selpakiroş da. Cotmeha 2003an, li Heskîfê. Nû weşiyabû, bêhna kaxizê şîl jê dihat. Min ji dengê helbestêkê godarî kiribû û gotibû, “ka careka di ji bixwîne lo!” Ew jî hat hawarê. Dû re Francesco Petrarca (1304-1374) bi risteyekê hat li dilê min danî. Lê ez ê çawa risteya wî wergerînim? Min rîste şand bo Şener Özmen û pîrsî: “Divê ev rîste di helbestê da hebe, lê meriv ê peyva ‘horsesflying’ çawa wergerîne?” Ew binav metnê û ferhengên ket. Hat bîra minku Cumhuriyet Olmez li ser Mem û Zîneka Goranî teza xwe çêkirîye; ez jî şahidê ked û kelecana wî me. Got, “Bozê Rewan difire, lê peyva ‘flying’ nîne di guhertoyên dastanê da.” Şener da pey peyvên wek “winged”, “flyer”, sky horse.” Ji hejmara taybet a li ser hespan a Grûba Kurmancî (1991) heya Mehmet Emin Bozarslan çû û xwe gihand peyvên wekî “çengdar”, “teyar” û “fironek.” Peyva firoke hat bîra min, ku têjîkên berşeyên li şanêşîna min jî hêdî hêdî firoke dibûn û wek hespên duçeng

çav li asmîn bûn. Gava Cumhuriyet ji xwe ra kîre derd û şev nivê şevê telefon kir û got di Farisî de “perende” ye, “firende” hat bîra min kudi ferhengê Zana Farqînî de ji heye. Şener û Cumhuriyet gotin dibe û mor kirin.

Piştî Petrarca, Resoyê Gopalan jî hat hawara poetîk ku ji Seyîdxanê Kerr ra dibêje, “ji ordiya maran e.” Peyva ordî, ji Tirkî tê. Çîma Tirkî? Hunermend ji zîmanê kujerê lehengîne, nakokiyê lê siwar dike û bîra helbestê kurtîr dike. Lê min di helbesta xwe da got “artêş”, di-viya hubra pênûsa min ji li ser bûya.

Me dîrokek heye. Heke siya Agirî nede ser Kobanî, em ji çi ra ne? Em bo çi jîyan? Naxwe divê Yado, Ferzende, Seyîdxan, Şêx Seîd, Rostemê Zal û Keyxusrev ligel hespên xwe bîra hawarê da şerêkî “Rostemî” biqewime. Ku çûbin hawara wan hespan, divê kêl hişyar bûbin ku min kêl ji hişyar kirin. Heke hesp şerî bikin, divê xwelî rabe ji bin simên wan ku jê re dibêjin “moran.”

Êdî dikarim helbestê binivîsim. Hevalan fînim ber çavê xwe. Dengbêj gotiye “biskbitêl”, dengbêj gotiye “enîdeq”, dengbêj gotiye “belekçav”, dengbêj gotiye “şêrê bigulî”, dengbêj gotiye “qewmê tofanê”, dengbêj gotiye “sinca reza.” Li ser wan dibe sîngedewran, pê-sîrtengî û xeza. Rêhevalên wan “sêr” dikin li şerê wan. Keç û xort in, beza ne, difirin û gotina wan a dawîn, xwe digihîjîne ruhê Xeyrî ku digot, “Heke ez mirim, li ser gora min viya binivîsin: ‘Gava çû, deyndarê gelê xwe bû.’”

Beşa 8. ji “Hilbe Kobanî”

dozdeh heval li Serzorê li ber teyrên kelaşxwer venîştîne li ser gulan, pelg diberiqîn ji bîhnê dadane çekên xwe û kef bi ser devan ketiye geh huzmeş e, geh çargav e û geh ji rewanê kaw

dozdeh heval li Serzorê li ber teyrên kelaşxwer kihêl û hedwan û sinjabî difirin bi bê re kumêt û şînboz û bedewî datînin bi şê ve dibêjî qey Yado vejîyaye li vir û Nîgar ji Şêx Saîd û Derwêş, Ferzende Beg û Eznawir Yan Rostem û Rexşê Belek yan Keyxusrev û Şevdiz

dozdeh heval li Serzorê li ber teyrên kelaşxwer şiyar bûne hemû kêlên welatî ji xewa kûr her çî bûye dîsa dibe di hundirê demê da heyhedan û Moran e, diorin stirûh û boqilnefir

“me nihêrî li dengê baskên binefîşî yê hespên firende” ji “artêşa maran” in, diçingîn gava roj diçe ava me dît ku çî hespên kapreş bûn, rabe û bibîne binivîse li ser deriyê Goristana Serzorê, bêje:

- hemû lehengên li vir raketî deyndarê gelê xwe ne!

